## Pirsgirêkên global û civakî



Pirsgirêkên civakî her dem yek ji mijarên herî giran ên çalakiya zanistî ya mirovî bûne. Civakek çiqas zû pêş bikeve, pirsgirêkên bi vî rengî yên berbiçav xwe diyar dikin, her sal pîvan her ku diçe mezintir dibin. Pêşketina teknolojîkî gihiştiye xala xweya herî zêde... ***Kurdistan Lezgîveya / R.8***

## Kesayetiya mêtingehî û hunermend



Mêtinger dema ku hebûna binerd û sererd ya gelekî, dewlemendiya dîrokî û çandî ya gelekî talan dike; dema ku li ser gelê mêtingeh bernameyeke dagirkirin û venêranê pêk tîne, gelên heremê yên ku li hemberî vê yekê derdikevin rastî zordestî û tundiyeke dijwar tên... ***Îlham Bakir / R.11***


# xwebûn

5-11 TÎRMEH 2021 HEJMAR: 81 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org




# Divê her kes tev li berxwedanê bibe

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK), li başûrê Kurdistanê bi gelek sazî, rêxistinên civakî, rewşenbîr û derdorên cuda re hevdîtin pêk anî. Di hevdîtinan de li ser mijarên yekîtiya neteweyî û operasyonên dersînor a Tirkiyeyê axivîn. Hevseroka KNK'ê Zeynep Muradî têkildarî hevdîtinan û mijarên di rojevê de ji rojnameya me re axivî. Muradî anî ziman ku divê li hemberî dagirkeriyê helwesteke neteweyî bê nîşandan û wiha axivî: "Ji bo KNK bikaribe dagirkeriyê bisekinîne û di heman demê de bi helwesteke neteweyî em xwedî li wê berxwedana ku li hember dagirkeriya Kurdistanê disekine, derkevin." Muradî, bêdengiya PDK'ê rexne kir û bi lêv kir ku pêwist e li hember bêdengiyê jî helwestek neteweyî bê nîşandan... ***Hevpeyvîna Bêrîvan Kayî / R.4***

FELEMEZ ULUG

## Bi hevkariyê azadî nayê... *R.6*



# Gundan dikin dibistan

Komeleya Lêkolînê ya Ziman û Çandên Mezopotamyayê (MED-DER) piştî kampanyaya ziman bi xebateke nû ya ji bo pêşketina ziman car din zendê xwe badaye. Vê carê MED-DER dê serdana gundên Kurdistanê bike û li gundan dersên kurdî bide zarokên kurd. MED-DER her gundekî dike dibistanek... ***R.3***



## Divê girtiyên nexweş bên berdan

Li Tirkiyeyê hejmara girtiyên nexweş zêde dibin û tenduristiya wan girantir dibe. Piştî derketina vîrusa koronayê nexweş ji mafê tedawî û dermankirinê bêpar dimînin û mafê wan ê tenduristiyê tê binpêkirin. Girtiyên nexweş dema diçin nexweşxaneyê 14 rojan di qarantînayê de dimînin. Gelek girtiyen nexweş bi hinceta 'şewb heye' nayên dermankirin. Li gorî daneyên Komeleya Mafê Mirovan (ÎHD) li girtîgehên Tirkiyeyê 604 jê giran hezar û 605 girtiyên nexweş hene. Parêzer Yûsûf Erdogan, têkildarî rewşa girtiyên nexweş ji rojnameya me re axivî û diyar kir ku rayedar bi awayekî siyasî nezî wan dibin û xwest girtiyên siyasî di çarçoveya rewşa tenduristiyê de bên nirxandin û berdan... ***R.3***

## Daristanan dişewitînin

Hêzên Çekdarên Tirk (TSK) bi fermana hikûmeta AKP-MHP'ê li bakur û başûrê Kurdistanê her roj operasyonên leşkerî pêk tînin. Di operasyonan de ketin û derketina gundan li welatiyan qedexe dikin û daristanan dişewitînin. Gundan tecrîd dikin û daristanên welatiyan dişewitînin. Di salên 1990'î de JÎTEM'ê û cerdevanan li Kurdistanê gund vala kirin û şewitandin. Niha jî TSK, pêşmerge û cerdevan bi fermana AKP-MHP-PDK'ê daristanan dibirin û dişewitînin. TSK, li Şirnex, Mêrdîn, Amed, Sêrt, Çewlîg, Bidlîs û Colemêrgê di operasyona de li Çiyayê Gabar, Bagok, Pîran, Zozanê Şênê, Besta û Çiyayê Çewligê agir bi daristanê xistin... ***R.3***



**Civak, travma û ziman** Cemil Guneş / R.5

## Utî

Tarîxê utî şono heta seserra 17'inan. O çaxî ra nata însanî qeybî kincanê xo rast bikerê kincan utî kenê. A çaxî siyê giranî ke kerdê sûrî qeybî utîkerdişî şixulnayêne. Dima ra hesin şixulnayî. Amerîka ra Henry Seely serra 1882'î de utîya ke bi elektrîk xebetêna îcat kerd.Tam kamco serre bî nîno mi vîr la serranê 1980'an de dewey ma de zî merdimê ke utîya ci bibî, estbî. Utîya bi agir/komîr şixulêna şixulnayêne...
***Cemîl Oguz / R.9***



## Seyîdxan û Elîcan

Mem û Tajdîn, Sîyabend û Qedê, birader in, bi bext in; tevan ji belayê re ferman xwendine. Sed sal berê Seyîdxan û Elîcan jî bi heman awayî, serî dane heman rêyê, birader in û bext in... ***Ayhan Erkmen / R.12***

## Qurmiçokên destên wan êşa wan vedibêje

Xizanî... hejarî... feqîrî. Gelo mirov dikare çawa pênaseya wê ya ku bandorê li tevahiya jiyana me, civaka me û erdnigariya me dike, bike. Mijara xizaniyê bi qasî dîroka mirovahiyê kevn e û di her serdeman de civak bi xizaniyê re rûbirû mane. Piştî şoreşa sanayiyê û bi pêşketina makîneyan re karker bi sefalet û birçîbûnê re rûbirû man û vî tiştî bandor li tevahiya civakan kir û êdî hejariyê bi giştî di rojeva cîhanê de cih girt. Li gorî çi û kijan pîvanan xizanî... Pênaseyên ku tên kirin li gorî kes, civak, welat û parzemînan diguhere. Zêdebûna nifûsê, koçberiya bi zorê, hişkesalî, karesatên xwezayî, pirsgirêkên siyasî û civakî, cudakariya çînî ya di nav civakan de, belavbûna dahatê, qeyrana aboriyê, bêkarî û enflasyon yek bi yek dibin sedemên feqîriyê... ***Leyla Ayaz / R.2***

# Qurmiçokên destên wan êşa wan vedibêje

Leyla Ayaz

Her jinek serpêhatiyek û çîrokekê wê heye. Şopên serpêhatiyên wan li rû û destên wan ên qurmiçî xwe didin der. Awirên çavên wan hêrsa wan a jiyana ku li wan hatiye ferzkirin e. Bi qurmiçokên destên xwe û neynokên parçebûyî li dijî xizaniyê derdikevin

Xizanî… hejarî… feqîrî. Gelo mirov dikare çawa pênaseya wê ya ku bandorê li tevahiya jiyana me, civaka me û erdnîgariya me dike, bike. Mijara xizaniyê bi qasî dîroka mirovahiyê kevn e û di her serdeman de civak bi xizaniyê re rû bi rû mane. Piştî şoreşa sanayiyê û bi pêşketina makîneyan re karker bi sefalet û birçîbûnê re rûbirû man û vî tiştî bandor li tevahiya civakan kir û êdî hejariyê bi giştî di rojeva cîhanê de cih girt.

Li gorî çi û kîjan pîvanan xizanî… Pênaseyên ku tên kirin li gorî kes, civak, welat û parzemînan diguhere. Zêdebûna nifûsê, koçberiya bi zorê, hişkesalî, karesatên xwezayî, pirsgirêkên siyasî û civakî, cudakariya çînî ya di nav civakan de, belavbûna dahatê, qeyrana aboriyê, bêkarî û enflasyon yek bi yek dibin sedemên feqiriyê.

Dahat-mezaxtin û derfetên jiyanê (tenduristî, perwerde û xwedîbûn) ev rêbaz hemû dibin pênaseya xizaniyê. Li her deverên cîhanê cihê xizanan diyar e, cihê ku lê dijîn jî bi awayekî bi pergal û bi zanetî tên sazkirin û ev cih li wan tên ferzkirin. Kesên hejar û malbatên feqîr li taxên xizan digihêjin hevdu û li vir dibin parçeyek. Ev tişt wek nasnameyekê ji wan re dimîne. Xaniyên xirab, karên herî nebaş, muçeyên herî kêm û standarta jiyanê ya herî kêm dibe para wan.

**Gelo hêz û rêbazên çareseriyê nîn in?**

Di vê serdemê de ev bajar û welatên ku bi avahî û balexaniyên xwe navdar in, bi pêşketinên xwe yên bajarvanî û dewlemendiyê pesnê xwe didin û rastiyê vedişêrin. Bajarên ku pesnê wan tê dayîn û bi îhtişam li ser pişta wan xizanan hatine avakirin û sazkirin. Kesên ku di avakirina wan cihan de ked dane piştre jî nikarin di ber deriyên wan avahiyên bi îhtişam re derbas bibin. Ji ber ku xizan in û ne li gorî çîna wan in, ji bo wan kesan ev kes tenê karker û kesên feqîr in. Bi pêşdarazî nêz dibin, biçûk dîbînin û her wiha tiştê herî balkêş jî ji bo wijdanê xwe rihet bikin jî alikariya pere, cil û berg û xwarinê dikin. Qaşo bi vî rengî jî wezîfeya xwe ya li hemberî civakê tînin cih.

Ev tişt ne bi serê xwe pêk tê, pergala serdest a bi hezar salan li ser vê hîmî zîhniyeta xwe xurt dike. Li aliyekî xizmetê dide aligirên xwe yên ku zîhniyeta wan diparêzin û ji aliyekî din ve jî hemû beşên civakê tînin pêşberî hev. Ev tişt bi organîze pêk tê. Polîtîkayên ku wê hişmendiyê diparêzin bi taybetî naxwazin pirsgirêka xizaniyê çareser bikin. Dewlet bi pakêtên sînordar, dayîna alîkariya pere ya demdemî û veqetandina bûdçeyeke kêm civakê dixapîne. Gelo hêz û rêbazên çareseriyê nînin ku ev pirsgirêk bên çareserkirin?

**Divê jin bi rola xwe rabin**

Piştî ku li tevahiya cîhanê der barê feqîriyê de lêkolîn zêde bûn, derket holê ku koma herî zêde xizaniyê dijî jî jin in û her wiha koma herî bi dezavantaj in. Cudakariya çînî, netew, ziman, ol û newekheviya di navbera zayendan de bi tevahî dora jinan dorpêç kiriye. Ev tiştên ku jin her roj bi wan re rû bi rû dimînin derî li ber xizaniya jinan vedikin. Di jiyana rojane de ew yek bêtir zelal xuya dike.

Jina ku li malê di nav 4 dîwaran de bi xizan maye hewl dide ku ferdên li malê bide jiyîn. Ji ber ku berpirsiyariyeke wisa lê hatiye ferzkirin. Çi dibe bila bibe, di kijan şert û mercan de dibe bila bibe divê jin bi rola xwe ya di nava civakê de rabin. Di nav tunebûnê de hewce ye ku sêniyeke xwarinê dayne ber ferdên malbatê. Heman tişt ji bo jinên ku li derve dixebitin jî derbasdar e. Piştî wezîfeyên xwe yên malê xilas dikin ji bo debarê berê xwe dide derve... Jinên ku li kolanan bi komkirina gelaşê debara xwe dikin, jinên ku berê êvarê li bazaran li pey sebzeyên xirab dikevin…



**Her jinek serpêhatiyek wê heye**

Keda jinan a ku li malê nayê dîtin, li qadên xebatê jî nayê dîtin. Li malê bi tundiyê re rû bi rû dimînin, li cihê kar jî bi heman tundiyê re rû bi rû dimînin. Li malê jî di destê wê de perê nîne, li cihê ku dixebite jî pereyeke kêm digire. Li mal û cihê kar newekhevî, di nav civakê de cudakarî û xizanî rastiya jinan e lê di nirxandin û şîroveyên ku giştî tên kirin de her tim koma ku nayê dîtin ya jinan e.

Her jinek serpêhatiyek û çîrokekê wê heye. Şopên serpêhatiyên wan li rûyên wan û li destên wan ên qurmiçî xwe didin der. Awirên çavên wan hêrsa wan a li hemberî jiyana ku li wan hatiye ferzkirin e. Bi qurmiçokên destên xwe û bi neynokên parçebûyî li dijî xizaniyê derdikevin.

# Îmzekirin jî xwevekişandina ji peymanê jî siyasî ye

Navenda Nûçeyan



Tirkiye di 20’ê adarê de bi qanûnnameya serokkomarê tirk Tayyîp Erdogan ji Peymana Stenbolê vekişiya. Û Peyman di 1’ê tîrmehê de bi fermî ji meriyetê hat rakirin. Jinên ku li dijî biryara betalkirina Peymana Stenbolê ji 20’ê adarê û vir ve li qadan e, roja ku Peyman ji meriyetê hat rakirin jî li gelek bajaran daketin qadan û çalakiyan pêk anîn. Tevî hemû astengiyan jî jinan bi yekdengî gotin ‘Heta em nebêjin qediya naqede’ û ‘Peymana Stenbolê ji bo me neqediyaye.’

Lê hikûmet ku armanca wê ya sereke tunekirina destkeftiya jinan e, bi hin nîqaşan dixwaze qanûna 2684’an ku ji bo parastina jinan hatiye çêkirin jî, betal bike. Di derheqê qanûna 2684’an de ji Navenda Mafên Jinan a Baroya Amedê Merva Demîrcan ji rojnameya me re axivî.

Merva Demîrcan bal kişand ser bandorên qanûna 2684’an û wiha got: “Vê qanûnê di serî de di girtina biryarên hiqûqî yên bilez da û zûagahdarkirina rayedarên pêwendîdar hat çêkirin. Lê her dem derbas bû, me wekî parêzer fêr kir ku van biryaran nikarin erkên xwe yên parastin û pêşîlêgirtinê pêk bînin. Gelek biryar bê fonksiyon bûn, yekeyên peywendîdar hewcedariyên biryaran bi cih neanîn.”

Demîrcan diyar kir ku jin ji ber ku dizanin rayedar vê qanûnê pêk naynin ji ber wê, dema ew tundiyê dibînin serî li rayedaran nadin û ev tişt anî ziman: “Navenda Şopandin û Pêşîlêgirtina Tundiyê (ŞONÎM) ji hêla Peymana Stenbolê ve hat damezrandin. Navenda ku dihat payîn dê ji bo mexdûrên tundiyê bibe stargeh, piştgiriya hiqûqî, psîkolojîk û aborî peyda bike, nikare vê hêviyê bi cih bîne. Bi kurtasî qanûnê ji 2012’an heya niha mixabin pêşî li tundiyê negirtiye û mexdûr ne parastine.”

**Armanca benda 15’an a qanûnê**

Di axaftina xwe de Demîrcan got ku armanca benda 15’an ya qanûna 6284’an bi rêya ŞONÎM’ê ji bo tawanbaran xebatên rehabilîtasyon, dermankirin, pîşeyî û rêberiyê pêk bîne û wiha axivî : “Bi vî rengî dixwazin çavkaniyên tundiyê bibînin û tundiyê biqedînin. Dadgeha malbatê dikare li ser daxwazkirina van tedbîran biryar bide. Lê belê gengaz e mirov bibêje ev mekanîzma di pratîkê de nayên xebitandin û lêkolînên wiha bi kiryarên tundiyê re nayên kirin. Ev qanûn hema hema di girtina biryaran de tenê piştî çalakiya tundûtûjî pêk hatiye û bi fermî parastina mexdûrên tundiyê ye.”

Demîrcan axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Bêguman ji bo jinan pêdivî ye ku di warê wezaretê de cih bigirin. Di van salên dawî de jin nûnertiya wezaretê dikin û tundiya li ser jinan disekinin. Her çiqas ev rewş di teoriyê de erênî xuya bike jî mixabin ev wezîr di pratîkê de haya wan ji wekheviya zayendî û mafên jin, zarok û komên dezavantaj tune ne.”

## ‘Qanûna 2684’an qanûneke navxweyî ye’

Demîrcan destnîşan kir ku Tirkiye ji Peymana Stenbolê bi awayekî dijhiqûqî vekişiyaye û wiha domand: “Di rastiyê de ev vekişîn vekişîneke pûç û vala ye. Qanûna hejmara 6284’an rêziknameyeke qanûna navxweyî ye. Di vê wateyê de bêguman gengaz e ku vê qanûnê bê betalkirin. Lê betalkirina qanûnekê divê li gorî qanûn û destûrê be. Tenê parlamento dikare biryara betalkirina qanûnê bide. Ger qanûna hejmara 6284’an bi biryarnameyeke bêyî ku li gorî qanûn û destûrê tevbigere were betal kirin dê ev qanûn wek qanûneke ku nehatiye betalkirin yanî wek vekişîna ji Peymana Stenbolê tune were hesibandin.”

## ‘Divê mexdûr bêne parastin’

Demîrcan anî ziman ku di Peymana Stenbolê û qanûna bi hejmara 6284’an de, ya ku qanûna pêkanîna peymanê ye, tê destnîşankirin ku hemû saziyên dewletê di rewşên tundiyê de hewce ye bi komên dezavantaj re bixebitin û wiha pêde çû: “Li gor vê qanûnê divê mexdûrên tundiyê zû û bi bandor werin parastin, pêşî li tundiyê bê girtin û bêcezatiya kesên ku tundiyê kiriye were astengkirin. Fatma Altınmakas yek ji van jinan bû. Wê serî li qerekolê dabû. Xwestibû li dijî tecawiz û ewlehiya jiyana xwe doza parastinê bike. Her çiqas mafê Fatma yê bikaranîna wergêr ji hêla rêziknameyên qanûnî ve hat dabînkirin jî ev garantî hat binpêkirin. Tu dewlet ne hewce ye ku di çarçoveya hiqûqa navneteweyî de peymanekê îmze bike. Îmzekirina peymanan ji ber sedemên siyasî, pêdivîbûna şopandina pêşveçûnên li cîhanê ye. Lê piştî peyman hatin îmzekirin hewce ye ku peymanan pêk bînin. Dewlet ji ber sedemên siyasî çawa peymanê îmzekirin bi heman awayî ji peymanê vekişiya. Nesepandina zagonan jî safî siyasî ye.”



## Mizgefta Feqiyê Teyran bûye warê penaberan

Navenda Nûçeyan

Yewnanistanê 42 penaberên kurd, iraqî û sûrî bi rê û rêbazeke nedîtî li Tirkiyeyê vegerand. Polîsên Yewnanistanê ji 42 penaberan kincên 12 penaberên ku dixwestin ji ser Yewnanistanê ve derbasî Ewropayê bibin ji wan kir, ew tazî û rût kirin û dûre radestî Tirkiyeyê kir. Dîmenê penaberên ê li ser sînor her tiştî bi aşkera vedibêje.

Guzergeha penaberan ji destpêkê heta dawiyê bi xetereyên cûr bi cûr dagirtî ye. Yek ji qonaxa penaberan jî Kurdistan e. Sala borî li Wanê, 2 jê zarok 61 penaber di Gola Wanê de xeniqîn. Di 27'ê hezîranê 2021'ê de, li navenda Bêdarê ya bi ser Berwariya Sêrtê leşkeran gule li qamyonê reşandin û 2 penaberan jiyana xwe ji dest da û 12 kes jî birîndar bûn.

**Ji Tetwanê heta Amedê**

Qonaxeke girîng ya penaberan jî Amed e. Penaberên ku ji sînorê Wanê derbas dibin pêşî tên Tetwanê. Hinek ji wir yekser berê xwe didin Stenbolê, lê hinek bi arastekirina bazirganên mirovan berê xwe didin Amedê. Mizgefta Feqiyê Teyran a li hemberî otogarê bûye warê penaberan. Penaberên ji Tetwanê tên, li hinda mizgeftê vedihesin. Ji ber ku nahêlin li mizgeftê bimînin, li ber dîwarên mizgeftê radiwestin. Çavê wan tim li ser otogarê û li benda xeberekê ne.

Piraniya van penaberan peştûyên ji Afxanistanê û Pakistanê ne. Piranî ji ber şer, bêkarî û bêderfetiyê welatê xwe diterikînin. Mirinê didin ber çavên xwe û berê xwe didin welatên Ewrûpayê.

**Penaberî mafekî mirovahiyê ye**

Rojnameya me çû mizgefta Feqiyê Teyran û bi penaberan re axivî. Derdora 60 penaberan li hinda sûra mizgeftê, li hewşa mizgeftê, li bin siha darên pêşberî otogarê rûniştibûn. Penaberekî ku bi farisî axivî, diyar kir ku ew ji Tetwanê hatine vir û li vir li bendê ne ku derbasî Stenbolê bibin û got: "Deh roj in em li termînala Tetwanê bûn. Em birçîne. Dema wan em bi erebeyê anîn vir, em hemû li ser hev di paş erebeyê de bi cih kirin.

**Sînorê li Wanê yê kuştin û talanê ye**

Penaber, destnîşan kir ku roja ji welatê xwe derdikevin û heta xwe digihînin Ewropayê herî kêm du meh dibore û wiha axivî: "Em ji ser Wanê re derbasî Tirkiyeyê dibin. Ev xet pir talûke ye. Li aliyê Îranê, pasdarên Îranê li ser sînor êrîşê me dikin, li me didin. Pereyên me desteser dikin û carinan me gulebaran dikin. Li hêla Tirkiyeyê leşkerên tirk li me dixin, pereyê me desteser dikin."

Penaberekî din jî wiha got: "Leşkerên tirk bi awayekî pir sert û tund li me dixin. Wan lê da bêvila hevalê me şikandin, leşkerekî li min xist û ez ji ser hişê xwe ve çûm, hevalên me tên kuştin."

**Neçar in biçin**

Penaberekî din bi peştûyî ji penaberê ewil re tiştinan dibêje û ew jî vedigere wiha didomîne: "Pir zêde pirsgirêk hene. Birçîbûn, tîbûn, kuştin, rev, bêpereti em wiha bê hal dikevin. Em neçar nebûna em rêya dûr û dirêj û talûke nedihatin. Lê em mecbûr in."

Polîsên hatin pêşiya sûrên mizgeftê, bi dengekî bilind û heqaretwarî bi ser penaberan de qêriyan û gotin: "Rabin, bicehmin, bicehmin, bicehmin." Penaberê ku hîn bû ew polîs in, mîna çav bi cinan ketibe, ji nişkê ve rabû. Xwe kom kir û berê xwe da kolana otogarê. Piştî demekê mizgefta Feqiyê Teyran xaneke xik î xalî ma.

# Girtiyên nexweş derman nakin

Navenda Nûçeyan

**Gelek girtiyên nexweş ji ber nayên dermankirin bi mirinê re rû bi rû ne. Girtiyên nexweş, li gel rapora Saziya Tipa Edlî jî serbest nayên berdan. Li gorî rapora Komeleya Mafê Mirovan li girtîgehan, 604 jê giran, hezar û 605 girtiyên nexweş hene**

Li Tirkiyeyê hejmara girtiyên nexweş zêde dibin û tenduristiya wan girantir dibe. Piştî derketina vîrusa koronayê nexweş ji mafê tedawî û dermankirinê bêpar dimînin û mafê wan ê tenduristiyê tê binpêkirin. Girtiyên nexweş dema diçin nexweşxaneyê 14 rojan di qarantînayê de dimînin. Gelek girtiyen nexweş bi hinceta 'şewb heye' nayên dermankirin. Li gorî daneyên Komeleya Mafê Mirovan (ÎHD) li girtîgehên Tirkiyeyê 604 jê giran hezar û 605 girtiyên nexweş hene. Ji ber girtî tedawiyên wan baş nayên kirin û rewşa wan a tenduristiyê ji bo ku li girtîgehan bimînin ne guncav e û tevî vê yekê ji girtîgehan nayên tehliyekirin û jiyana xwe ji dest didin.



Têkildarî van mijaran Endamê Komîsyona Girtîgehan a Komeleya Mafê Mirovan ê Amedê Parêzer Yûsûf Erdogan agahî dan rojnameya me.

Parêzer Yûsûf Erdogan, bal kişand ser serdanên girtî û malbatên girtiyan ên têkildarî binpêkirina mafê mirovan, zext û îşkenceyan û wiha got: "Bi taybetî ji aliyê girtiyan û malbatên girtiyan ve têkildarî binpêkirinên mafê mirovan ên li girtîgehan gelek serdan tên kirin. Têkildarî îşkence, muameleyên nebaş û binpêkirina mafê mirovan gelek serdan tên kirin. Ji bo ku ev binpêkirin ji holê bên rakirin gelek serdanên hiqûqî ji aliyê komeleya me ve tên kirin. Vekirina girtîgehên nû, ji aliyê rayedar an jî alîgirên desthilatdariyê ve wekî xizmetê tê pêşkêşkirin nayê qebûlkirin. Girtîgeh wekî mekanên îzolekirina mirovan û binpêkirina mafê mirovan dertê hemberî mirov. ÎHD li şûna avakirina girtîgehên nû, her tim xwestiye dawî li binpêkirina mafê mirovan bê anîn."

**Divê tecrîd bê rakirin**

Erdogan, der barê çalakiyên grevên birçîbûnên ên li girtîgehan ku li dijî binpêkirina mafan û tecrîdê didomin de jî wiha got: "Wekî tê zanîn li dijî binpêkirinên mafan gelek girtî berê jî niha jî çalakiyên greva birçîbûnê didomînin. Divê hikûmet daxwaza rewa û mafdar a girtiyan li ber çavan bigire û dawî li binpêkirinên mafan û tecrîdê bîne. Mijara din a girîng jî li girtîgehan gelek binpêkirinên tenduristiyê hene. Bi taybetî em diyar dikin ku rîska nexweşketina mirovên herî bitendurist jî li girtîgehên Tirkiyeyê pêkan e. Ji ber vê yekê hinek hemwelatiyên ku dikevin girtîgehê ji ber nexweşiyên kronîk hîn zêdetir nexweş dikevin û şertên wan ên tedawiyê jî ji ber hincetên mevzuatan tên astengkirin."

**Girtî bi mirinê rû bi rû ne**

Erdogan, anî ziman ku tedawiyên girtiyên nexweş nayên kirin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Tedawiyên girtiyên nexweş li nexweşxaneyan pir kêm hatin kirin. Tevî ku şertên paşxistina înfazê hebûn jî gelek nexweşên girtî ji ber hincetên mevzuatan nehatin tehliyekirin. Gelek girtiyên nexweş bi mirinê re rû bi rû ne. Di demên borî de ji ber vê gelek girtiyên nexweş jiyana xwe ji dest dan. Divê rewşa girtiyên nexweş li gorî rewşên polîtîk neyên nirxandin. Ji bo tedawîkirina girtiyên nexweş divê hemû astengiyên ku ji mevzuatê diqewimin ji holê bên rakirin û girtî bên tehliyekirin. Li Tirkiyeyê 604 jê giran hezar û 605 girtiyên nexweş hene.."

**Bernedana girtiyan polîtîk e**

Erdogan, bal kişand ser astengiyên ku nahêlin girtiyên nexweş bên berdan û got: "ÎHD hewl dide astengiyên hiqûqî ji holê rabin û girtiyên nexweş bêne berdan. Aşkera di xala hejmara 5275'an de tê xuyakirin ku gelek astengiyên hiqûqî li pêşiya girtiyên nexweş hene. Divê ku girtiyên siyasî beriya her tiştî li gorî girîngiya mijarê ji nexweşxaneyan bi rêk û pêk raporê bistînin û paşê jî ji aliyê Saziya Tiba Edlî ve jî raporek were amadekirin. Li gel rapora Saziya Tiba Edlî jî girtî ji ber aliyên siyasî nayên berdan. Gelek caran serlêdanên me yên ji bo taloqkirina cezayê, tevî ku rapora nexweşxaneyên bi rêk û pêk û rapora Tiba Edlî jî heye bi behaneya ku ji aliyê ewlekariya civakî ve talûkeyê çêdike, daxwazên me tên redkirin û cezayên girtiyên siyasî nayên taloqkirin. Divê ku mafê girtiyên siyasî di çarçoveya rewşa wan a tenduristiyê de were nirxandin û serbest bên berdan.

**Banga ji bo girtiyên nexweş**

Erdogan, herî dawî jî bo rewşa girtiyên nexweş banga hişyariyê kir û got: "Di van demên dawiyê de wekî ku di medyayê de jî hate dîtin girtiyê nexweş Mehmet Emîn Ozkan yê ku bi zorê dimeşe, mînaka herî berbiçav ya vê pêvajoyê ye ku rewşa girtiyê nexweş radixe ber çavan. Gelek girtiyên din ên nexweş ku rewşa wan jî wekî ya Mehmet Emîn Ozkan her ku diçe xerabtir dibe. Ji ber van raporên neyînî serbestberdana wan tê astengkirin. Saziya me ji bo serbestberdana girtiyên nexweş bi saziyên din ên civaka sivîl re xebateke çalak dimeşîne û bi wan re di nava hevkariyê de ye, lê ya rast divê raya giştî ya demokratîk jî ji bo girtiyên nexweş her dem di nav hewldanan de bin.



# Gundiyan tecrîd dikin û daristanê dişewitînin

Navenda Nûçeyan

Hêzên Çekdarên Tirk (TSK) bi fermana hikûmeta AKP-MHP'ê li bakur û başûrê Kurdistanê her roj operasyonên leşkerî pêk tînin. Di operasyonan de ketin û derketina gundan li welatiyan qedexe dikin û daristanan dişewitînin. Gundan tecrîd dikin û daristanên welatiyan dişewitînin. Di salên 1990'î de JÎTEM'ê û cerdevanan li Kurdistanê gund vala kirin û şewitandin. Niha jî TSK, pêşmerge û cerdevan bi fermana AKP-MHP-PDK'ê daristanan dibirin û dişewitînin. TSK, li Şirnex, Mêrdîn, Amed, Sêrt, Çewlîg, Bêdlis û Colemêrgê di operasyonan de li Çiyayê Gabar, Bagok, Pîran, Zozanê Şênê, Besta û Çiyayê Çewligê agir bi daristanê xistin. Bi milyonan zindiyên di nava axê û daristanê de şewitîn. Li Başûrê Kurdistanê jî bi sedan kamyon dar birîn û firotin.

**Daristana Bestayê şewitandin**

Leşkerên li herêma Bestayê ya Şirnexê, derketin operasyonê û agir berdan daristanê. Çavkaniyên herêmê diyar kirin ku li herêmên Girêgivara, Bestahincê, Germav û Kanîfeşkê leşkeran agir bi daristananê xistine. Welatî ji ber operasyonên leşkerî nikarin şewatê vemirînin.

**Beşeke mezin a daristanê şewitî**

Li navçeya Dara Hênê ya Çewligê, di 25'ê hezîranê de, şewat derket û li gundên Guzeldere, Derebag, Çamliyûrt û Sagokpinar belav bû. Şewat 3 kîlometre dûrî navenda navçeyê, belav bû. Çavkaniyên herêmê diyar kirin ku wesayîtên agirkuj nikarin bikevin qada ku şewat lê derketiye. Welatiyan destnîşan kirin ku ger şewat neyê vemirandin, gundê Guzeldere wê bikeve bin xetereyeke mezin.

Di 20'ê hezîranê de li beşa Çiyayê Cûdî ya gundê Hesena yê navçeya Silopiya ya Şirnexê şewat derket. Welatiyan anîn ziman ku rayedaran mudaxaleyê şewatê nekiriye û agir belav dibe.

**Qedexe kirin û şewitandin**

Şewata daristanê ya piştî bombebaranê li gundê Hor ê girêdayî Bedlîsê derket, ji 12'ê hezîranê ve didome. Walîtiya Bedlîsê di 12'ê hezîranê de li 35 gund û gundikan qedexeya derketina derve îlan kiribû. Qedexe di 14'ê hezîranê de bi dawî bû, lê şewat belav dibe.

Çavkaniyên herêmî diyar kirin ku şewata li heremê belav dibe û destûr nadin kes mudaxeleyê şewatê bike.

**Berê birîn û piştre şewitandin**

Qonaxa duyem di sala 2020'î de li Heftanînê dest pê kir. Tirkiyeyê li herêma Heftanînê gelek dar birîn û talan kir. Gundiyan diyar kirin ku rojane 350-400 ton dar bi wesayîtên bar veguhestine bakurê Kurdistanê. Şîrketa Mencet Înşaat a li Şirnexê vî karî dike. Kesê bi navê Metîn Babat berpirsiyariyê vê şîrketê ye. Hem daran dibirin, hem jî TSK bi îhaleyan rê çêdike, qulibeyên çavdêriyê, qereqol û baregehan çêdikin. Şîrketa Mencet daran dibire û bi kamyonan dişîne Dîlokê û difiroşe şîrketeke din. Pereyan jî li cerdevan û artêşê parve dikin. Şîrketa Mencet 400 kamyon dar bi buhayê 400 milyon lîreyê Tirkiyeyê firotin û ji van pereyan 250 milyon lîre jî wergirt.

Tirkiye ji bo her tonek dar bişîne aliyê bakurê Kurdistanê bi qasî 400 dolaran qezenc kiriye. Ji van 400 dolaran 180 dolar ji bo şîrketa PDK'ê ya li Zaxo ye.

TSK'ê niha li Metîna dest bi şewitandina daristanan kiriye. Leşker bi taybetî li gundên Kêste, Hiror, Çelkê Nesara, Deşîş û Orêbax û baxçeyan dişewitînin. Li dijî vê talankariyê li Silêmanî, Hewlêr, Îdareya Raperîn, Germiyan û Helebçeyê welatî meşiyan. Lê Parlementoya Herêmê li ser vê talankariya Tirkiyeyê bêdeng ma.

## TENÊ HEVDÎTINÊN KNK'Ê TÊRA YEKITIYÊ NAKIN

# Pêwistiya me bi yekrêziyê heye

Bêrîvan Kayi

*Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê bi armanca ku li dijî êrîşên Tirkiyeyê, dagirkirina axa Başûr û ji bo avakirina yekitiya neteweyî ev demeke dirêj e li başûrê Kurdistanê hevdîtinan pêk tîne. Giringiya rola KNK'ê di van rojên dawîn de her diçe zêdetir dibe. Ji bo ku gel, sazî û rêxistinên li başûrê Kurdistanê êdî dengê nerazîbûnên xwe bilindtir dikin û KNK jî ji bo vê yekê dibe deriyê yekitiya neteweyî. Têkildarî hevdîtinên KNK'ê yên ku li Başûr hatine kirin, em bi hevseroka KNK'ê Zeyneb Muradî re axivîn.*

**Ji roja ku operasyonên Tirkiyeyê dest pê kirine vir ve, hûn wek hevserok û şandeya KNK'ê, xebatên xwe yên ji bo yekitiyê dimeşînin. Niha hevdîtinên we di çi astê de ne?**

Rast e ji roja 24'ê nîsanê ve li hember operasyon û êrîşên dewleta Tirkiyeyê em wek şandeya KNK'ê, bi awayekî fîlî ketine nav xebatan û me maseyeke krîzê ava kir. Ji wê rojê heta roja îro xebateke berfireh tê meşandin. Çimkî îro her kes dizane ku îro dewleta tirk bi planek berfireh dixwaze axa Kurdistanê dagir bike, gelê me tune bike. Ev niyeta Tirkiyeyê xuya û aşkere ye. Destpêkirina roja operasyonê ku 24'ê nîsanê roja qirkirina ermeniyan bû, em bi xwe vê rojê wek mesajekê dibînin. Tirkiye mesaja qirkirina gelê kurd û ya hemû gelên qedîm dide. Niha KNK di asteke herî jor de û bi şiklekî cidî nêzî vê rewşê dibe û me dest bi kar û xebatan kiriye. Bi taybetî ser asta başûrê Kurdistanê û paralel ligel vê xebatê xebatên navneteweyî di asta dîplomasiyê de jî hatin meşandin.

Niyet û armanca dewleta tirk kifş e. Di roja îro de li ser sê parçeyên Kurdistanê êrîşên xwe didomîne. Em dibînin li ser bakurê Kurdistanê ku çawa hemleyên siyasî, civakî û yên qirkirinê dimeşîne û ji bo vê yekê jî hemû rê û rêbazan bi kar tîne ji bo tunekirina gelê me yê li bakurê Kurdistanê deskeftiyan tune dike. Di heman demê de me dît çawa li rojavayê Kurdistanê jî operasyonên leşkerî ên dewleta tirk roj bi roj xwe berfireh dike. Hem di dagirkeriya Efrînê de hem jî berî wê di şerê azadiya Kobanê de ku çawa piştgirî didan çeteyên DAIŞ'ê. Piştî wê jî dagirkeriya Serê Kaniyê û deverên din û di heman demê de me dît ku di 24'ê nîsanê de li ser başûrê Kurdistanê operasyon da destpêkirin.

Ev êrîş hemû dikin ku bi gelê kurd re jî helwesteke neteweyî bi pêş bikeve ku em bikaribin li dijî van êrîşan bisekinin. Heta demeke dirêj jî di asta metirsiya van êrîşan de helwestek yekgirtî, nebû. Ne di asta navxweyî ne jî di ya navneteweyî de nebû. Loma KNK takesaziyek bû, wek saziyek navneteweyî kete nav liv û tevgerê. Ji bo rêkxistina yekxistina van deng û helwestan ku em bikaribin bi helwesteke neteweyî li hemberî dagirkeriyê bisekinin hatine gel hev. Her wiha ji bo KNK bikaribe dagirkeriyê bisekinîne û di heman demê de bi helwesteke neteweyî em xwedî li wê berxwedana ku li hember dagirkeriya Kurdistanê disekine, derkevin.

**Gel, sazî, partî, siyasetmedar û rewşenbîrên hûn bi wan re hevdîtinan dikin ji bo êrîşên Tirkiyeyê yên li ser axa Başûr çi dibêjin, vê yekê çawa pênase dikin?**

Rast e di 22'yê meha gulanê de me dest bi kar û xebatên li başûrê Kurdistanê kir. Bi hevdîtinên li gel partî û saziyên başûrê Kurdistanê me bi dehan sazî û rêxistin û rewşenbîr û akademîsyen, rêxistinên jinan, ciwanan û hwd. re hevdîtin pêk anîn. Di nav van hevdîtinan de di demeke nêzîk de me ev metirsî anîn ziman. Ji metirsiya vê rojê agahdar in. Bi hesasiyetekê nêzîk dibin. Jixwe nerazîbûnên wan li hemberî êrîşên dewleta tirk hebûn ne ku bi hevdîtina me dest pê kir. Lê mixabin van derdoran heta niha nikaribûn helwesteke fermî aşkera bikin. Wek nirxandinekê ez dikarim bibêjim ku hevdîtinên me baş derbas dibin lê têrê nakin.

Ez dixwazim bibêjim di van hevdîtinan de ku me bi kes û rêxistinên re, bi pêkhateyên wek aşûrî, kildanî, suryaniyan re jî hevdîtin kiriye, wan jî bi heman rengî helwesta xwe ya ji bo êrîşan anîn ziman. Bi taybetî em îro mêze dikin ku bi dehan gundên aşûriyan ên nêzîkê sînoran, ên herêma Behdînanê tên valakirin. Li gundiyan îşkence tê kirin. Di heman demê de xweza û sirûşta Kurdistanê tê talankirin. Lê her kes jî vê talankariya Tirkiyeyê dibîne. Mixabin heta roja îro ne di aliyê resmiyetê de wek hikûmeta herêma Kurdistanê, di asta hikûmeta herêma Kurdistanê de helwesteke resmî der barê dagirkeriya Tirkiyeyê derketiye holê. Heman demê helwestek ji hikûmeta navendî ya Iraqê jî derneketiye. Her kes jî dizane ku êrîşên dewleta tirk sînoran nas nake. Niha îro êrîşên xwe ne tenê li ser çiyayên Kurdistanê, dixwaze li tevahiya Kurdistanê belav bike. Ji ber ku dixwaze xeyalên xwe yên dewleta Osmanî bi cih bîne, dixwaze wilayeta Mûsilê carek din ava bike. Wek tê zanîn di 2023'an de salvegera hevpeymana Lozanê ye. Ji ber vê yekê jî dê operasyonên Tirkiyeyê nesekinin heta ku hemû başûrê Kurdistanê têxê bin dagirkeriya xwe. Dixwaze Misaqê Milî nû bike. Vê yekê jî li ser kurdan û pêkhateyên li ser vê axa qedîm, dixwaze têxe meriyetê. Loma jî em wek Kongreya Netewî ya Kurdistanê dibêjin ku bersiva herî guncav avakirina yekrêziyeke neteweyî ya Kurdistanê ye. Ev bêdengiya PDK'ê û ya hikûmeta navendî her diçe cesareteke gelek mezin dide Tirkiyeyê. Loma em wek KNK'ê di xebatên xwe de bi israr in. Heta roja me ya îro jî hevdîtinên me berdewam in. Em dixwazin bi helwesteke biryardarî li hemberî van êrîşan û li hemberî vê bêdengiyê bisekinin. Ji bo ku em jî bersiveke şênber bidin êrîşên dewleta tirk û deskeftiyên xwe biparêzin.



KNK'ê gelek hevdîtin bi sazî, rewşenbîr, kesayet û derdorên cuda re pêk anîn û nerazîbûna her kesî û metirsiya her alî heye. Lê divê her kes bi helwesteke neteweyî tevbigere û xwe tev li vê berxwedanê bike

Ez dikarim bibêjim ku helwesteke van sazî, rêxistin, siyasetmedar, rojnameger, parlamenter, akademîsyen û ya hemû pêkhateyan wek me gotî heye. Çi ji aliyê gel ve çi jî ji aliyê sazî û rêxistinan ve helwestek heye. Roj bi roj tevlêbûn zêdetir dibin, zêdetir dengê xwe bilind dikin. Meş hene xwepêşandan hene, nerazîbûnên li hember dagirkeriyê hene. Helwestên wan erênî ne lê bes ev tenê têrê nake. Pêwistiya me bi xebatên hevbeş heye, pêwistiya me bi rêxistinkirina yekgirtinê heye. KNK pêngava destpêkê bû. Bi kurtasî helwestên wan bi awayekî erênî bûn lê têrê nake û hewce ye di pratîkê de hê zêdetir em têkevin nav liv û tevgerê.

**Ji aliyê PDK'ê ve heta niha we bi hin kes an derdoran re hevdîtin kirine an na? Ger we kiribin an nekiribin jî helwesteke çawa nîşan didin li hember şandeya KNK'ê? Ev helwesta wan tê çi wateyê?**

Bi awayekî fermî heta niha jî me tu hevdîtin li gel PDK'ê pêk neaniye. Em li bendê ne û me di gelek kanalan de daxwaz kiriye. Em mîna pêwistiyê dizanin ku ew ê têkevin nav van xebatên me yên ji bo yekitiyê. Ji bo parastina deskeftiyên gelê me, ji bo parastina statûya herêma Kurdistanê ji ber ku ev deskeftiyên gelê me ne. Xeteriya dewleta tirk ne tenê li ser aliyekî Kurdistanê ye, li ser çar parçeyan e, li ser tevahiya gelê kurd û deskeftiyan e. Ji ber vê yekê jî ev peywira me teva ye û hewce ye li hemberî êrîşên Tirkiyeyê em destkeftiyên xwe biparêzin û yekitiya xwe ava bikin. Yanî hewce ye em her kes helwestekê li dijî dagirkeriyê nîşan bidin.

Di çarçoveya serdanê me de em tenê di asta Silêmanî û Hewlêrê de nemane. Em çûn me serdana deverên cuda jî kir. Wek mînak em çûn serdana deverên sînorên herêma Başûr ên wek bajarê Xaneqînê. Me li wir li gel gelek kesên wek rewşenbîr, siyasetmedar û bi gel re hevdîtin çêkirin, me bi gel re civînên berfireh pêk anîn. Di heman demê de li bajarê Kerkûkê li gel kesayetên siyasetmedar û akademîsyen û eşîran re me civîn pêk anîn. Ew jî vê metirsiya dagirkeriya tirk ya li ser axa başûr dibînin. Bi vê mijarê re jî eleqedar bûn û nerazîbûnên xwe anîn ziman. Di heman demê de li Ranya û Hewremanê, li kampa Mexmûrê jî me hevdîtin pêk anîn. Bi gelê kakaî re û gelek derdorên din re jî me hevdîtin pêk anîn. Hevdîtinên me tev jî xwedî bandoreke erênî bûn.

**Herî dawiyê we serdana Rêxistina Jinên Azad a Kurdistanê (RJAK) kir û di vê hevdîtinê de qala lidarxistina kongreyeke jinan a li ser asta her çar parçeyê Kurdistanê hat kirin. Tu dikarî ji me re qala çarçoveya ve kongreya jinan bike?**

Diyar e wek kongreya neteweyî ya Kurdistanê, wekî komîsyona jinan a KNK'ê li gel endamên me ya li asta başûrê Kurdistanê, asta ofisê me yên li başûrê Kurdistanê hevdîtinên berfireh li Hewlêrê, Silêmaniyê û hemû deverên din me ew ziyaret kirin û bi taybetî me civînên jinan jî çêkirin. Çimkî em di wê baweriyê de ne ku îro jinên kurd pêşengtiyê ji bo xebatên netewî bikin û dikarin pêşentiya xebatên ji bo yekitiya Kurdistanê di asta herî jor de bikin. Hevdîtinên me yên li gel jinan û rêxistinên jinan bi awayekî erênî bû. Her çiqas ku di gelek mijaran de cudahiyek hebe jî di navbera rêxistin û saziyên jinan de xaleke hevpar hebû ku ew jî xala yekitiya Kurdistanê bû û êrîşên Tirkiyeyê bû.

**Dê cara yekem kongreyeke neteweyî ya jinan bê lidarxistin. Gelo ev dê bandoreke erênî li yekitiyê bike ango dê rê li ber diyaloga kurdî-kurdî veke?**

Heta niha kongreyeke jinan a ji bo yekitiya neteweyî nehatiye lidarxistin lê em difikirin û pêwistî jî pê heye ku tenê em li başûrê Kurdistanê kongreyeke jinan a ku em tê de êrîşên li ser xaka başûr bi awayekî berfireh nîqaş bikin. Amadekariyên wê heta niha jî ne pir zelal e. Lê em dikarin bêjin ku pêwistiyeke mezin bi kongreyeke jinan a ku hemû rêxistinên jinan li bakur bên gel hev, heye.

## Zeyneb Mûrad kî ye?



Zeyneb Mûrad yek ji hevserokê Kongreya Netewî ya Kurdistanê ye. Di meha çile ya 2019'an de di KNK'ê di kongreya xwe ya 19'emîn a asayî pêk anîbû û di encamê de hevserokên xwe yên nû hilbijartibû. Zeyneb Mûrad Sahrab û Ahmet Karamûs bûbûn hevserokên KNK'ê. KNK di 24'ê gulana sala 1999'an de di civîneke giştî de bi amadebûna 700 nûner û mêvanên Kurd û biyanî li bajarê Amsterdamê paytexta Holendayê, li navê KNK, Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê sazûmanek hatiye avakirin.

# Civak, travma û ziman

Cemîl Guneş

**Pirsgirêk û travmayên civakî dîsa bi alîkariya civakê û bi taybetî jî bi zimanê civakê tên dermankirin, çawa ku ziman dibe sedema travmayê, ew dikare wê travmayê baş jî bike**

Mirov di nava jiyanê de roj bi roj bi aliyekî zimên dihese. Ji ber ku ziman bi gelek aliyê jiyanê re têkildar e, ev jî dibe taybetiyeke zimên. Ev taybetiyên zimên aîdiyeta mirovan bi wê civakê re çêdike loma em dikarin bibêjin ku yek ji wan pênaseyên giring jî ew e ku ziman aîdiyet e. Ango ziman aîdiyeta mirovan bi malbatê, civakê û welatê xwe re çêdike. Ji ber sosyolojiya civak û welatan ango ji ber sebebên wek şer, koçberî, aborî û civakî gelek têgihên cuda yên zimên derketine holê. Hin ji wan têgihên giring zimanê zikmakî, zimanê yekem, zimanê duyem, zimanê biyanî ne.

Zimanê zikmakî ji bo mirovan tiştekî bêhempa ye. Mirov zimanê xwe yê zikmakî ji malbat û derdora xwe hîn dibe. Di nav vê hînbûnê de tenê dengên zimên tune ye, her wiha çand, huner û kevneşopiyên civakê jî heye. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku zimanê zikmakî laşê mirovan e yan jî ew laş di nav malbatê de û bi zimanê zikmakî zexm dibe. Ji ber ku mirov xwe û jiyanê cara pêşîn bi zimanê xwe, di nav civaka xwe de nas dikin, loma ew aîdiyeta mirovan jî bi awayekî herî xurt bi zimanê zikmakî çêdibe. Zimanê zikmakî bi xurtkirina aîdiyetê, di demên pêş de ji bo serkeftin, dilxweşî, xwendin, nivîsîn, guhdarîkirin û axaftineke baş roleke giring dilîze. Her wiha zimanê zikmakî rê li ber xwenasîn û xwebaweriya mirovan jî vedike û ev xwebawerî û xwenasînî bi xwe re ji aliyê derûnî ve rehetiyekê jî tîne. Taybetiyeke din ya zimanê zikmakî jî avakirina nasnameyê ye. Ev nasname bi du awayên cuda çêdibe. Yek jê nasnameya takekesî bi xwe ye ku bi hin taybetiyên zimanê zikmakî ava dibe û ev taybetî jî dirûvekî didin karekterê mirovan. Ev nasname di serdema zaroktiya pêşîn de ava dibe ku zarok di vê serdemê de çalak e û bi derdora xwe re têkiliyeke xurt datîne. Ango mirov bi avabûna vê nasnameyê û li gor taybetiyên zimanê xwe yê zikmakî li dinyayê dinêrin. Ya din jî nasnameya civakî ye ku aîdiyeta mirovan ya bi civakê re çêdike û mirov di nav civakê de dibe xwedî nasname. Ev civak dibe ku malbat, derdor yan jî welat be. Têkiliya mirov û civakê bi wê nasnameyê xurtir dibe û ev xurtbûn alîkariya avakirina xwebûna mirovan dike. Mirov bi zimanê xwe û bi wê têkiliyê dibe endamek civaka xwe. Heke mirov ji van avantajên zimanê zikmakî sûdê wergirin, êdî dê bixwazin ji bo xwe û civaka xwe hewl bidin û tiştinan hilberînin. Lê ev tiştên ku em dibêjin di wan şertan de pêk tên ku zimanek li warê xwe, ji aliyê axêverên xwe ve bi awayekî azad bê bikaranîn. Heke ne wisa be, zimanek çawa ku ji bo başî, xweşî û serkeftiyan amûreke hêja be jî mixabin di hin rewşan de dibe sersebeba xerabî, nexweşî û têkçûnan.

Astengkirina zimanê zikmakî avantajên ku me li jor qal kir vediguherîne dezavantajeke travmatîk. Travma, birîndarbûna giyanî ye ku nahêle mirov bi awayekî baş bifikirin, hîs bikin û xeyal bikin. Ango mirov bi awayekî, tên sînorkirin. Ferzkirina zimanekî duyem ya li ser mirovan jî cihekî şûn de êdî xisareka mezin dide wan. Ev astengî nahêle ku mirov bi zimanê xwe yê zikmakî jiyanê bitahmînin û dibe sebeba ku ziman têk biçe. Di vir de zimanê zikmakî tê sînorkirin, ev rê li ber gelek bûyerên travmatîk vedike. Wexta ku zimanê zikmakî bi pêş ve neçe, zehmet e ku zimanê duyem jî bi pêş ve biçe. Mirov di wê rewşê de êdî dikeve pêvajoya nîvzimaniyê. Ev nîvzimanîbûn tenê bi rewşa zimên bisînor nabe, di demên pêş de bandora xwe li her aliyên mirovan dike û wan di gelek waran de nîvco û sînorkirî dihêle. Mixabin ev rewş mirovan dike nav rewşeke xeter. Mirov êdî li dibistan û derveyî dibistanê nikarin hunerên xwe yên axaftin û guhdarîkirinê pêk bînin, xwe ji hevalên xwe kêmtir dibînin, tirsa wan ya ku têkevin nav mirovan roj bi roj zêdetir dibe. Helbet ev di demên pêş de bandorê li gelek aliyên wek derûnî, aborî û civakî yên mirovan jî dike. Kesên ku li saziyên fermî nikaribin xwe îfade bikin, li nexweşxaneyan nikaribin nexweşiyên xwe bînin zimên, ne xwedî fersenda pêşvebirina ziman, çand û muzîka xwe bin, li derveyî welatê xwe rastî lêdan û kuştinê werin, ji aliyên dewletê ve rastî girtinê werin ji vê rewşê re mînakên berbiçav in. Di vir de rola zimên ya di travmayê de bi awayekî zelal derdikeve pêşiya me.


Wek ku me got li cihê ku mirov xwe aîdî wê derê nebînin, bi wê derê re li hev nakin û ev nelihevî rê li ber pêşveçûn û hilberîna mirovan digire. Ev têkçûn bi serê xwe namîne û bi înkarkirina çand û zimanê neteweyekê dîsa dibe sebeba travmayan. Di encama van polîtîkayên înkarkirin û tunekirinê de mirov ji ziman, çand, civak û malbata xwe fedî dike, zimanê xwe wek sûcdarekî sereke yê têkçûna xwe dibîne, her wiha nirxên xwe yên malbatî û civakî wek dijminan dibîne û dikeve nav şerekî hundirîn. Ji ber van rûdanan ew rola zimanê zikmakî ya avakirina nasnameyê derbeke mezin dixwe û êdî nasnameya takekesî ya mirovan temam nabe her wiha avakirina nasnameya civakî jî dikeve nav xetereyê . Kesên ji aliyê nasnameyê ve di nav pirsgirêkan de bin, bi xwe û bi civakê re li hev nakin. Ji xeynî van rûdanan, kiryarên mîna kuştin, girtin û zextan jî vê travmayê kûrtir dikin. Ev bûyerên ku di nav jiyanê de diqewimin dibin sebeb ku mirov dev ji zimanê xwe yê zikmakî berdin. Zarok ji bo aîdiyeta xwe guh nadin zimanê xwe yê zikmakî, malbat jî ji bo ewlehiya xwe û zarokên xwe terka zimanê zikmakî dikin. Êdî piştî van qewimînan em dikarin bibêjin travmaya ku ji kesan dest pê dike, dibe travmayeke civakî.

Bêguman ev pirsgirêk û travmayên civakî dîsa bi alîkariya civakê û bi taybetî jî bi zimanê civakê tên dermankirin ango ziman çawa ku dibe sedema travmayê, her wiha dikare wê travmayê baş jî bike. Di çareserkirina travmayê de amûra herî bibandor ragihandin û pêwendîdanîn e û ev jî bi alîkariya zimên çêdibe. Her wiha wek ku me li jor jî qal kir yek ji taybetiyên zimên ya herî giring xurtkirina aîdiyetê ye. Aîdiyet çiqas xurt be, ew îhtîmala başbûna mirovan jî ewqas pêkan dibe. Çawa ku travma dibe sebeba dûrketina ji çand û zimanê xwe, veqetîna ji civakê, her wiha ziman jî bi xurtkirina aîdiyeta kesan ya bi civakê re mirovan li xwe vedigerîne, ziman û çanda wan li wan bi qîmettir dike. Bêguman mirov bi civakeke xurt, bi hefizeyeke xurt dikare ji vê travmayê derkeve. Cihê ku ziman lê berbelav be û têkildarî zimên hefizeyeke xurt ya civakê hebe, çand û hunera civakê zindî be êdî mirov bi awayekî hêsan ji civaka xwe qut nabe û bi awayekî hêsan pêşiya travmayê digire. Lê mixabin xetereya nîvzimaniyê, kêmbûna bikaranîna zimanan, zextên li ser zimên û biçûkxistina zimanê civakê, rewşa heyî zehmettir dike.

Li cihê ku rewşa civakê ya zimanî û travmatîk zehmettir bûye, yan jî li cihê ku civak bi xwe nikaribin ji heqê xwe bên der, civakên sivîl dikarin bi vê rola civakê rabin. Roleka giring ya saziyên civaka sîvîl heye di navbera serdestbindest, gel-dewlet û kes-civakê de. Ango civaka sivîl rêya sêyem e di navbera van de. Civaka sivîl bi xebatên zimên, bi raporkirina neheqiyan, bi xebatên çandî û hunerî, bi xebatên rêbertiyê dikarin rewşa civakê ya heyî hinekî din jî baştir bikin. Ji xeynî van xebatan dikarin rêbertiya têkoşîna bidestxistina mafên zimanî bikin û dewletê zêdetir nêzî çareseriyê bikin. Bi van xebatan ji aliyekî ve aîdîteya mirovan ya bi civakê re xurt dibe, li aliyê din jî bi xebatên zimanî civak ji rewşa travmayê dikare derkeve.

Civaka kurd ji ber polîtîkayên dewletê yên zimên di nav travmayeke kûr de ye. Ji qada perwerdeyê heta nexweşxaneyan, ji qadên aboriyê heta qadên civakî ev rewş berbelav e. Înkarkirin, astengkirin û qedexekirina zimanan ya ji avabûna komarê ve her ku diçe kûrtir dibe. Mixabin bandora van polîtîkayan ya li ser civakê jî her ku diçe kûrtir û xerabtir dibe. Di encamên van polîtîkayan de guhertinên berbiçav yên mîna nîvzimanîbûn, xwekêmdîtin, xerîbbûna civakê û têkçûnên cuda derdikevin holê. Kêmbûna axiftina zimanê zikmakî ya di nav gel de, bêqîmetkirina zimanê zikmakî, ferzkirina zimanekî duyem civakê ji halê heyî xerabtir dike û ev jî dibe sebeba belavbûn û kûrbûna travmayê. Divê civak û civaka sivîl bi rola xwe rabin û ji her carê zêdetir kar bikin. Divê xebatên piralî yên zimanî ji bo bi zarokan, jinan , dêûbavan û ciwanan re bên kirin. Her wiha divê giringiya zimanê zikmakî bi xebatên berfireh bên vegotin. Li aliyê din jî divê ji bo fermîkirina zimanê zikmakî têkiliyên xurt bên danîn di qada netewî û navnetewî de. Wext kêm e lê travma zêdetir dibe, rêya me dirêj û barê me giran e.



Sîdar Jîr

## OROK: Newaya çîrokeke efsûnî ye

Di edebiyatê de hin berhem hene her ku diçe mirov bêhtir lê vedibe û çêjeke xweştir jê werdigire. Bêguman di hemû beşên hunerî de ev rewş bi heman awayî ye. Piştî demekê mirov li xwe diheyirînin û ji nû ve mirov lê vedigere. Li dinyayê gelek hunermend, muzîkjen û wêjekarên wisa hene, pê bawer bibin ku nivîskarê kurd H. Kovan Baqî jî yek ji wan e û gelek kes ji me/we wê lê vegerin. Ev ne vegerek keyfî ye, heger em/hûn bi edebiyat û nivîsê re mijûl û aleqedar bin êdî ev zarûrî ye…

Xwendevanên asayî di metnên edebî de li navendekê(!) digerin. Lê di metnên H. Kovan Baqî de yan gelek navend hene yan jî divê mirov gavekê wêdetir biçe ku hîç navend tune ye. Di pirtûka wî ya dawîn a bi navê OROK'ê de jî bi vî rengî ye. Orok xeleka dawîn a sêbareyekê ye. Di vê sêbareyê de Sî'bera Zeyno, Siya Gotinê û wekî xeleka dawîn OROK heye. Di dûmahîka vê sêbareyê de, H. Kovan Baqî di OROKê de bi *zimanê xwe yê taybet xwendevanan ji rabirdûyê ber bi îro û dahatûyê ve dibe. Di vê romanê de wekî îluzyonîstekî, bêyî xwendevanan aciz bike di bihurên zemên re, ber bi zimanekî mîstîk dixe nava bablîsokeke efsûnî û ber bi rasteqîniya mirovî ve pifî ruhê xwendevanan dike.*

Di romana OROK'ê de nivîskar beriya her tiştî li pey wê yekê ye ku çîrokeke venegotî bi awayê em jê encamekê derxin û çîrokeke tuneyî jê derxin vedibêjin. Bi vî awayî îqtîdarê ji hebûnê ber bi tunebûnê ve rê ve dike. Hebûn û nebûn di bin hukmê nivîskaran de dinepixe yan diçilmilse, di OROK'ê de nivîskar di nava hewldana avakirina xwendevan de ye. Nivîskar wê yekê ji bo xwendevanên xwe dihêle. Piştî gotin û peyvên nivîskar, di OROK'ê de xwendevan li gorî dilê xwe newaya jiyana metnê ava dikin.

Di sêbareyê de Kovan Baqî jî *nehiştiye ew mezin bibe* û rê daye ku xwendevan di geşedana romanê de xwe û nivîskar bi hev re mezin bike.

Di romana dawîn a sêbareyê de, anku di OROK'ê de *malzarok* dibe hêmayeke bingehîn û di wê malzarokê de şerekî bêhedar dest pê dike. Lê axir îsyanek dest pê dike û şerekî biqisûr û maksîmîlîze dest pê dike. Şer xezeb û 'serhildaneke' bêdawî û bêhizûr e êdî. Piştî vê yekê çîroka OROK'ê dest pê dike. Bi awayekî dîtir, OROK xwe hildiweşîne û ji nû ve dest bi avakirinê dike…

Di vegotin an jî 'venegotina' OROK'ê de muzîkalek bi ahenga li ser dika Cîhanê rê li ber bêsînoriyê dike.

H. Kovan Baqî bi hostetiya xwe li ser xwendevan ferz dike ku piştî vegotina xwe ya parçekirina navend û qarakteran, rê vedike ku ew (xwendevan) bi xwe qerekter û qehremanên xwe ava bikin û romanê biqedînin.

Di her rêzika OROK'ê de qarakterên ku Kovan Baqî ji hev wesle wesle kiriye êdî dimîne ji xwendevanên romanê re. Xwendevan çiqas jîr be H. Kovan Baqî ewqasî di romanê de dide ser hev.

Ji beriya bajarê Orokê û heta Ronesansê dema xwendevanan a avakirina hişekî heye. Baqî jî mafê vî hukmî dide xwendevanan.

OROK di encamê de bi newayeke mîstîk ji xwe re ji nû ve dinivîse û her tiştî ji nû ve ava dike. Loma jî nivîskar H. Kovan Baqî hukmê avakirinê bi vê romanê dide mista xwendevanên jîr.

OROK xwendevanan ber bi welatê(!) wan ve dibe û ji sifrê ber bi hebûnekê ve dahf dide… Loma jî OROK çîroka newayeke efsûnî ye.

***OROK- Baqî, H. Kovan, rêzeroman-III, 192 rp, Weşanên Lîs, 2020***

# Hişmendiya ziman hişmendiya neteweyî ye

Komeleya Lêkolînê ya Ziman û Çandên Mezopotamyayê (MED-DER) piştî kampanyaya ziman bi xebateke nû ya ji bo pêşketina ziman car din zendê xwe badaye. Vê carê MED-DER dê serdana gundên Kurdistanê bike, li gundan dersên kurdî bide zarokên kurd û xebatên xwe dewlemendtir bike

■ Bahadîn Akhan

Ji bo zimanê kurdî bibe zimanê fermî û zimanê perwerdeyê di 22'ê sibatê de xebata Kampanyaya Zimanê Kurdî hat destpêkirin û di vê çarçoveyê de ji sed hezarî zêdetir îmze hatin berhevkirin. Ji bo yekitiya neteweyî û rêlibergirtina polîtîkayên asîmîlasyona dewleta tirk xebatên li ser ziman û girêdayî zimanê kurdî li bakur bê navber didomin. Sazî û dezgehên Kurdistanê xebatên der barê ziman û çandê de pêş ketine wekî mîrateyeke berxwedanê ji nifşekê vediguhêzin nifşeke dîtir û ev mîrate bi vî awayî tê domdarkirin.

Komeleya Lêkolînê ya Ziman û Çandên Mezopotamyayê (MED-DER) vê carê dest bi xebateke nû ya ziman kir. MED-DER jî di nav de Komiteya 21'ê Sibatê di navbera 3-7'ê hezîranê de şahiya ziman li sê navendan; Cizîr, Wan û Amedê li dar xistibû û bi vî awayî armanc kiribû ku hişmendiya zimên di nav gel de xurtir bike û piştgiriyê ji bo kampanyaya îmzeyan berhev bike. Têkildarî xebatên nû yên ku MED-DER'ê dane pêşiya xwe û bernameya wan a xebatê, em bi Hevseroka Komeleya Lêkolînê ya Ziman û Çandên Mezopotamyayê, Şîlan Elmas Kan re axivîn.

**Dewlet standan qedexe dike**

Şîlan Elmas Kan bal kişand ser kampanyaya ziman û şahiyên ziman yên li her sê navendan pêk hatibû û wiha got: "Kampanyaya îmzeyan didome. Xebatên di vê babetê de berdewamdikin. Lê belê dewlet bi tu awayî nahêle xebatên vê kampanyayê, heta xebatên têkildarî zimanê kurdî pêş bikevin û astengiyan derdixe. Mesela rojane bi hezaran kes diçin navendên dan û standinê (AVM) yên li Amedê yên wekî Ceylan û Nînova û hwd. Me xwest ku em standên kampanyayê li van navendan vebikin da ku îmzeyan berhev bikin. Lê belê dewletê destûra vê yekê neda.dîsa jî çi dibe bila bibe em ê xebatên xwe yên ji bo ziman her bidomînin."

**Derûniya dewletê têk diçe**

Di berdewama axaftina xwe de Hevseroka MED-DER'ê Şîlan Elmas Kanê feraseta dewletê ya li dijî kurdan, zimanê kurdî û Kurdistanê ye nirxand û ev yek gotin: "Hişmendiyeke sed salî ya komarê heye ku pê nêzî kurdan dibe. Bi rê û rêbazên mîna tevkujiya cismî û çandî Komara Tirkiyeyê berê xwe da gelên suryan, ermen, kurd ên li herêmê û bi bernameyeke bi rêk û pêk a bişaftinê, tunekirinê xwe da ferzkirin. Lê belê ev aşkera ye êdî, ew kesên ku nikaribûn li hemb erî berxwedana kurdan polîtîkayên xwe pêk bînin niha di halekî xerab de ne, derûniya wan ne baş e. Kurd bi berxwedana xwe stûnên pergala dewletê dihejînin, diderizînin. Ew ji vê yekê ditirsin û dertên dibêjin kurdî ne li gorî pedagojiyê ye."



**Li dijî bişaftinê gund destpêk in**

Têkildarî xebata nû ya MED-DER'ê û armanca wê de jî Şîlan Elmas Kanê ev yek anîn ziman: "Berê têkiliya gund û bajara wiha xurt û berfireh nebûn. Gelek kurd koçber bûn, li bajaran hêwirîn, gund xalî man. Di vê çarçoveyê de pergala parastina zimanê kurdî ya li bajaran bi teherekî din pêş ket. Desthilatdariya dewletê xwe li bajaran bêhtir dide hîskirin. Ser vê yekê zimanê tirkî di hemû waran der serwer bû û piştî demekê li ber çavê me jî şîrîn bû. Ji ber ku bişaftineke berfireh li ser zarokên me, li ser çanda me heye me xwest em ji gundan dest pê bikin. Gund xala destpêkê ye ji bo me lê belê em ê vê xebatê tenê bi gundan sînordar nekin. Em bi heman şêweyî vê xebata bînin bajaran, nav sîte û apartmanên xwe.

**Tûrikê zarokan tûrikê ziman e**

MED-DER dê di destpêkê de bernameya xwe li çar navçeyên Amedê; Çinar, Farqîn, Gêl û Bismilê bide tetbîqkirin. Şîlan Elmas Kan der barê bernameya meşandina vê xebata xwe de jî got ku ew dixwazin bi vê xebatê helwesta civaka kurd destnîşan bikin û wiha pê de çû: "Di serî de me xwest em helwesta gundan, helwesta zarokên gundan bibînin. Bi salan e em xebatên ziman dikin. Em dizanin ku divê ev xebat bi navçeyan, bi bajaran re sînordar nemîne. Lê belê êdî divê xebat berfireh bibin û hişmendiyeke zimanî û neteweyî ava bibe. Gava ku ew hişmendî di nav civakê de çêbibe êdî dê pêwistî bi komeleyên bi vî rengî nemîne. Êdî gel dê di nav xwezaya xwe bi xwe de bizanibe ku çima pêwîst e zarok pêşî bi zimanê xwe yê zikmakî perwerdeyê bibîne. Her wiha em ê di çarçoveya dersên muzîkê de rîtmên muzîkê fêrî zarokan bikin. Em ê stranên kurdî fêrî wan bikin. Em ê karê boyaxê fêrî wan bikin. Me ji bo zarokan 'tûrik' amade kirine. Di tûrikê wan de ferhenga kurdî, tîpên kurdî, keskesor û boyaxên me hene, çîrokên me hene û ew ê li gorî naveroka çîrokan bikaribin wêneyan boyax bikin. Lê belê em ê vê bernameya xwe tenê bi gundan sînordar nekin. Me ji bo bajaran xebateke sîteyan daye destpêkirin. Em ê xebata xwe ya ji bo bajar û navçeyan bidin destpêkirin. Em ê bi palyaçoyan, bi çîrokan, bi helbestan xebata xwe bi rêk û pêk bikin. Hêviya me ew e ku em bi vî awayî rê li ber pergala bişaftinê bigirin."

**Êrîş li ku be berxwedan li wir e**

Şîlan Elmas Kan di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser polîtîkayên dewletê yên bişaftinê û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Bi salan e dewlet bi bernameyeke rêk û pêk êrîş dike, qir dike û tune dike. Meseleya ziman meseleya hişmendiyê ye. Pîvanê netewebûn û neteweperweriyê xwedîlêderketina zimanê kurdî ye. Dewlet êrîşê van biyavan dike, divê rexmî vê xwedîlêderketina van biyavan jî xurttir bibe. Gava em xebatekê ji bo ziman dikin ew bernameya wan a qirkirina çandî derban dixwe, pêwîst e em derbên xwe bi xebatên xwe zêdetir bikin. Dîsa dibêjim hişmendiya zimanê kurdî hişmendiya neteweya kurdî ye."



Xweşkanî

Felemez Ulug

# Bi hevkariyê azadî nayê

Dewleta tirk di 23'ê nîsanê de li dijî başûrê Kurdistanê dest bi êrîşeke berfireh a dagirkeriyê kir. Her çendî ev êrîş bi hinceta li dijî PKK'ê hatibe destpêkirin jî di hedefa ewil ya van êrîşan de gundên di bin serweriya PDK'ê hebûn. Bi van êrîşan re bi dehan gund hatin valakirin û bi sedan şêniyên herêmê hatin koçberkirin. Bi valabûna gundan re artêşa tirk bi hevkariya PDK'ê li hin deverên stratejîk ên herêmê xwe bi cih dike. Bi vê bicihbûnê ve diyar dibe ku niyeta dewleta tirk nîne ku demek kurt de ji herêmê derkeve. Lê ev êrîşên dewleta tirk ji kengî ve û çawa dest pê kirine. Em ê hewl bidin di vê nivîsa xwe de vê mijarê bigirin dest.

Dewleta tirk di êrîşên xwe yên salên 1992, 1995 û 1997'an de sernekeftibû. Lê piştî van êrîşan li gelek deveren Behdînan baregeh avakirin û bi erêkirina hin hêzên herêmî li van baregeha hebûna xwe berdewam kir. Bi avakirina van baregehan re dewleta tirk li herêmê her tim wek tehdîdekê hat dîtin.

Ev baregehên ku li herêmên di bin serweriya PDK'ê de hatine avakirin bi demê re bûn cihê sîxurtî û şerê taybet. Dewleta tirk di van baregehan de hevkarê xwe yê herêmê jî li gor têgeha xwe ya nijadperest û metînger perwerde kir. Lewma şirîkatiya bi PDK'ê re ya di salên 80'î de destpêkirî bi demê re veguherî hevkariyeke stratejîk.

Di sala 1992'an de avabûna hikûmeta herêma Kurdistanê ve bi serkêşiya PDK'ê û hin hêzên din yên herêmî ji bo qadên dibin kontrola gerîla de hêz hat şandin. Mîna roja me ya îro PDK'ê wê demê ji PKK'ê xwest ji herêmê derkeve. Wê demê dihat gotin di beramberê qebûlkirina hikûmeta herêmê de dewleta tirk ji PDK'ê û hêzên herêmê dixwest li dijî PKK'ê şer bikin.

Di 5'ê cotmeha sala 1992'an de bi piştevaniya artêşa tirk hêzên bi ser PDK'ê ve û êrîşî herêma Xakûrkê ya di bin kontrola gerîla kirin. Şerê li Xakûrkê dest pê kir belavî Heftanîn û Zapê jî bû. Di şerê ku bi hefteyan dewam kir de aliyên kurd wendahiyên mezin dan, dewleta tirk jî bi şerê di nav kurdan de kêfxweş dibû.

Ji bo bi dawîleanîna şer kesayetên siyasî û rewşenbîr ketin navberê. Di encama hewildanên van kesan de di navbera aliyan de hevdîtinan dest pê kir û agirbest hat îmzekirin. Ev pevçûnên ku di navbera hêzên kurd de qewimî darbeyek mezin li yekitiya kurd jî da.

Piştî îmzekirina peymana agirbestê bi 3 salan artêşa tirk bi tevlibûna 35 hezar leşker û cerdewanan di 21'ê adara 1995'an de bi navê "Çelîk Harekâti" dest bi êrîşek nû kir. Herêmên gerîla bi balafirên şer û helîkopteran ve bi dijwarî hat bombebarankirin. Ev êrîşa dagirkeriyê ya di bin fermandariya Hasan Kundakçi dihat rêvebirin û alîkariya PDK'ê ve 43 rojan dewam kir bê encam paşde vekişî.

Piştî wê bi salekê 6'ê adara 1996'an bi piştgiriya PDK'ê li dijî herêmê Heftanîn û Sinahtê tevgera dagirkeriyê ya bi navê "Atmaca" hat destpêkirin. Ji vê êrîşê jî encam nehat girtin. Di 12'ê gulana 1997'an de di bin navê "Çelîk Harekati" bi tevlêbûna 50 hezar leşkerî ve li dijî başûrê Kurdistanê êrîşek berfireh hat destpêkirin. Di vê êrişê de artêşa tirk balafirên şer, tank û helîkoperên nû yên ji hevkarên xwe NATO bi dest xistibû bi kar anî. PDK jî bi awayekî aktîf tev li vê êrîşê bû. Di encama vê hevkarî û li hevkirinê de PDK li Hewlerê êrîş bir ser cihê birîndarên PKK'ê. Di encama vê êrîşa PDK'ê de hunermend, rewşenbîr û rojnameger bi dehan kes hatin qetilkirin. PDK'ê cenazeyên van kesan li cihekî nediyar veşart. Tevî hemû hewildanên rayedarên PKK'ê jî PDK'ê heya niha cihê cenazeyê van kesan aşkera nekiriye.

Artêşa tirk ji vê êrîşê jî encam negirt û di tîrmeha 1997'an de ji neçarî paş ve vekişî lê, di îlona heman salê de vê carê bi navê "Şafak" dest bi erîşeke nû kir. Di vê êrîşa ku bi hevkariya PDK'ê û bi tevlêbûna 15 hezar leşkerên de hat kirin jî encam nehat girtin. Artêşa tirk di sala 1992'an de li herêmê hin baregeh avakiribûn. Di van salan de li herêmên mîna Batûfa, Bamernê, Diyala û Begova jî baregehên nû hatin avakirin. Di van baregehan de çekên giran hatin bicihkirin. Ji bo MÎT'a tirk li Hewlêr, Duhok û Zaxo yên di bin kotrola PDK'ê baregehên xwe vekin peyman hatin îmzekirin.

Ji sala 1997'an pêve PDK di çarçoveya peymanên li gel Tirkiyeyê îmzekiriye hewil dida PKK li herêmê asteng bike. Herî dawî PDK'ê di 14'ê cotmeha 2020'an de hêzekî mezin ber bi Garê ve şand û herêm dorpêç kir. Beriya vê dorpêçê hêzên PDK'ê yên bi navên Gulan û Zêrawanî li bejahiya gundên Spîlka û herêma Barzan hatin bicihkirin. Di 23'ê cotmehê de jî hêzên Gulan li ser riyê gunê li bejahiya gundên Dînartê, Melkê, Dosteka, Gîsê, Mezrînganê, Navxoş, Difrî û Mamişmişê bi cih bûn. 24'ê cotmehê jî hêzên Zêrewan li ser rêyên diçin qadên gerîla noqteyên kotrolê avakirin.

PDK ji bo vê dorpêçê kuştina Midurê Aasayîşa deriyê gumrikê yê Serzêrî Salih Elîxan ê ku di 8 cotmehê de bi awayekî guman hatibû kuştin kir hincet. Li ser mijarê Mûrat Karayilan banga hişyarî û xwînsariyê kir. Di heman demê de siyasetmedar Mihemed Emîn Pencewînî yê ku di pevçûnên sala 1992'an jî di navbera aliyên kurd de navbênkarî kiribû banga hişyariyê kir. Pencewînî di banga xwe de aliyên kurd hişyar kir û got: "Şerê ku di navbera hêzên kurd de biqewime wê belavî hemû Kurdistanê bibe."

Artêşa tirk a dagirker di berbanga 10'ê sibata 2021'ê bi helîkopteran eskerên xwe li herêma Garê danîn. Di armanca vê êrîşê de Biryargeha Navendî ya Hêzên Parastina Gel hebû. Ev êrîş piştî gotina Erdogan ya ku got: "Ez ê roja çarşemê mizgîniyekê bidim we" hat despêkirin. Artêşa ku li vê têk çû 14'ê sibatê paşve kişiya. Bi paşvekişînê hêza dagirker derket holê ku bikaranîna çekên kîmyewî ve komkujî pêk aniye.

Artêşa ku li Garê bi binket vê carê bi navê "Pençe-Şimşek" û "Pençe-Yildirim" di 23'ê nîsanê de li dijî Metîna, Zap, Avaşîn-Basyan dest bi êrîşek nuh kir. Li dijî vê êrîşê hikumeta herêma Kurdistanê ya ku di bin serkêşiya PDK'ê de hatiye avakirin bêdeng ma. Li ser bêdengiya hikumeta herêma Kurdistanê, Mûrat Karayilan ev tişt got: "Ev bêdengî êrîşkariya dewleta tirk rewa dike."

Artêşa tirk a ku li dijî berxwedana gerîla nikare pêş ve biçe xitimî. Ji bo berxwedana gerîla bişkîne û pêşî li leşkerên tirk bê vekirin, PDK'ê destê hevkariyê dirêjî dewleta tirk kir. Ji bo ji piştê ve gerîla dorpêç bike di 5 hezîranê de konvoyek mezin ku ji hêzên Zêrewan û Gulan pêk dihat ber bi qada Metîna ve şand.

Di dema derbasbûna konvoya hêzên PDK'ê, wesayîtek teqiya. Di wesaytîa teqiya de 5 pêşmergeyan jiyana xwe ji dest da. Wezareta Pêşmergeyan bêyî ku lêkolînekê bike yekser ji ber vê teqînê gerîla sûcdar kir. Berdevkê Navenda Çapemenî û Ragihandinê ya HPG'ê Serdar Yektaş li ser bûyerê bang kir ku şandeyek serbixwe bûyerê lêkolîn bike. Şandeyek ji parlamenterên başûrê Kurdistanê û Iraqê çûn cihê bûyerê lê beriya şande biçe wesayit ji wir hat rakirin. Kesên pispor daxuyand ku wesayîta pêşmergeyan ji hewayê ve hatiye lêdan. Tevî vê jî PDK gerîla tawanbar kir. Nehişt şandeya parlamenteran jî rapora xwe ya der barê bûyerê de aşkera bike.

Bi êrîşkariya dewleta tirk ve geşbûna şerxwaziya PDK'ê ji gelek aliyên cuda ve tên rexnekirin û ji bo di navbera hêzên kurd de pevçûn rûnedin banga hişyariyê dikin. Wê ev şer ji derveyî hêzên metînger ên Kurdistan dagir kirine kêrî kesî neyê. Lewma ji welat û derveyî welêt aktîvîst û çalakvanên siyasî, hunermend, rewşenbîr berê xwe didin başûrê Kurdistanê û banga yekitiyê dikin. PDK guhê xwe ji hemû bangan re girtiye.

Di vê serdema ku nexşeya Rojhilata Navîn ji nû ve tê nîqaşkirin de, şerekî muhtemel ê di nav aliyên kurd de biqewime wê bi gelê kurd mezin bide wendakirin. Divê tu alî pêşeroja gelê kurd nekin qurbana berjewendiyên xwe yên şexsî û hizbî. Ji ber vê yekê divê PDK'ê dawî li vê raboriya xwe ya hevkariyê bîne û dest bide destê yekitiya gelê kurd.

# 'Tirkiye emrê DAIŞ'ê dirêj dike'

Mehmet Alî Ertaş

Berdevkê Daîreya Têkiliyên Derve yê Herêma Xweseriya Demokratîk Kemal Akîf têkildarî projeyên DYA'yê yên li herêmê û helwesta Tirkiyeyê ya li dijî DAIŞ'ê axivî û diyar kir ku armanca Tirkiye ew e ku ciyên lê bi cih bûye firehtir bike




Di 28'ê hezîrane de li paytexta Îtalyayê, Romayê bi tevlêbûna gelek welatan li dijî DAIŞ'ê civînek hat lidarxistin. Bi serkêşiya DYA'ê gelek welat beşdarî Civîna Wezaretan a Koalîsyona Navdewletî ya Têkoşîna bi DAIŞ'ê re, bûn.

Têkildarî naveroka civînê û armanca Tirkiye û DYA'yê ya li dijî DAIŞ û herêmê Berdevkê Daîreya Têkiliyên Derve yê Herêma Xweseriya Demokratîk Kemal Akîf, ji rojnameya me re axivî. Kemal Akîf, anî ziman ku car car in civînên koalîsyonê yên li dijî DAIŞ'ê tên li dar xistin û wiha got: "Ev civîn bi serkêşiya DYA'yê pêk hat. Ji ber ku em di vê civînê de nebûn, ev civîn a wan e. Ev civîn çima çêbûye çawa çêbûye ji ber em ne di nav de ne em nikarin tiştekî bibêjin. Lê bi giştî ji bo bi rêxistinkirina şerê li dijî DAIŞ'ê pêk hatiye. Di civînê de sernavên hatin nirxandin wiha ne: DAIŞ bi rastî jî êdî xwe bi rêxistin dike, Şaneyên DAIŞ yên razayî ji nû ve zindî dibin. Hemû zarok, jin û ciwan û malbaten DAIŞ yên di destê Rêveberiya Xweser de li girtîgehê ne, tev hişmendiya DAIŞ'ê di serê wan de ye. Tiştê di vê civinê de hat nirxandin, divê êdî ji bo vê meseleyê her kes bibe alîkar."



**Koalîsyon û DYA**

Kemal Akîf bi bîr xist ku têkoşîna li dijî DAIŞ'ê alîkariya HSD'ê ya ji bo Koalîsyon û DYA'yê gelek girîng e. Akîf bal kişand ser alîkariya Rêveberiya Xweser û HSD'ê ya ji bo hêzên Koalîsyon û DYA'yê û got: "Alîkariya HSD û Rêveberiya Xweser a ji bo koalîsyon li dijî DAIŞ'ê bi ser bikeve gelek girîng e. Ji bo terora DAIŞ'ê ji nû ve xwe nû neke û xwe bi rêxistin neke alîkariya HSD'ê û Rêveberiya Xweser gelek girîng e."

**'Ji Serêkaniyê û Girê Spî moral girt'**

Akîf, bal kişand ser xetereya DAIŞ'ê û wiha berdewam kir: "Li herêmê û Sûriye tiştê herî talûke û xetereya mezin, xetereya DAIŞ'ê ye. Niha rasterast têkoşîneke li dijî DAIŞ'ê heye. Lê tiştê emrê DAIŞ'ê dirêj dike, destê Tirkiyeyê ye. DAIŞ'ê piştî dagirkirina Girê Spî û Serêkaniyê moraleke pir mezin girt. Piştî ev bajar dagir kirin, alîkariyeke pir mezin dan şaneyên razayî yên DAIŞ'ê."

**Hêlînên DAIŞ'ê**

Akîf bal kişand ser hevkariya Tirkiyeyê ya bi DAIŞ'ê re û wiha axivî: "Mînaka vê yekê jî gelek kesên fermandar û xwedî biryar ên di nava DAIŞ'ê de niha di bin sîwana Tirkiyeyê de li Girê Spî û Serêkaniyê hene. Navên xwe, cilên xwe û nasnameyên xwe guherandine, lê ew bi xwe DAIŞ in. Ji bo şerê li dijî DAIŞ'ê astengî hene. Ew astengî yek jê alîkariya Tirkiyeyê ya DAIŞ'ê ye. Planên DYA'yê yên demdirêj yên li herêmê em nizanin. Lê têkoşînek li dijî DAIŞ'ê tê meşandin."

**'DYA çi difikire em nizanin'**

Akîf bal kişand ser armanca DYA'yê ya li herêmê jî û wiha lê zêde kir: "Ji bo projeyên DYA'yê yên li herêmê divê ji DYA'yîyan bê pirsîn. Lê tişta em dizanin DYA dixwaze DAIŞ'ê ewil ji aliyê îdeolojîk û leşkerî de tune bike. Projeyên DYA'yê yên di demên pêş de ji bo Sûriyeyê çi ne bi rastî jî em nizanin. Ji ber tu hevpeyman di navbera me û wan de tune ye. Ew bi biryara xwe hatine. "

**'Dixwaze herêmê tevî kontrol bike'**

Akif li ser armanca Tirkiyeyê ya li Sûriye jî rawestiya û got: "Armanca Tirkiyeyê li her derê diyar e. Dixwaze qadên xwe yên li Sûriyeyê ku di nav de ye fireh bike. Dixwaze destkeftiyên li dijî DAIŞ'ê têk bibe. Dixwaze herêmê tevî têxe bin dagirkeriya xwe. Dixwaze ji nû ve DAIŞ'ê bi ruh bike û wê paşde vegerîne. Tirkiyeyê aşkere got: "Divê alîkariya hêzên ku bi Koalîsyonê re hevkarî kirine neyê kirin. Ew hêzên ku bi koalîsyonê re hevkarî kirin wekî teror bi nav kirin. Em vê pirsê dikin, ev hêzên wekî HSD, YPG, YPJ ku DAIŞ'a teror tune kirin, çawa Tirkiye wan wekî terorîst bi nav dike? Ya din ew qas piştgirî û alîkarî da DAIŞ'ê çima xwe wisa bi nav nake. Li vir bêwijdanî û bêehlaqiyek heye. Xebat û projeyên Tirkiyeyê ew e ku vê hevkariya HSD û Koalîsyonê tek bibin."

**' Statuya kurdan qebûl nakin'**

Akîf helwesta Tirkiyeyê ya li dijî kurdan jî nirxand û wiha bi dawî kir: "Tirk ji xwe qebûl nakin ku statuyeke kurdan hebe. Naxwazin projeyên kurdan ji bo pêkhateyên herêmê hebe. Di bin navê ewlehiya Tirkiyeyê de dixwaze hebûna xwe ya di nav NATO'yê garantî bike. Dixwaze kurdan tune bike û komkujiyê li ser kurdan pêş bixe. Mesela Efrînê, meseleya Girê Sipî û Serêkaniyê em tev dizanin. Em dizanin ku Amerîka rê nedaya Tirkiye, dê Tirkiye nikaribûn bihatina van bajaran. Wê nikaribûna ev herêm têxistina bin kontrola xwe. Niha dibêjin çima Amerîka piştgiriyê dide HSD. HSD ne hêza kurdan tenê ye. Ji gelek pêkhateyan pêk hatiye. Amerîka hem dixwazin hevkariya xwe ya bi HSD'ê re qut nekin û hem jî dixwazin tirkan jî razi bikin. Em jî dişopînin û em dixwazin fam bikin. Lê halê hazir di aliyê amerîkayiyan de tiştekî zelal tune ye. "

## Welatiyên li gundên ser sînor bêzar in

Ev 30 sal in ku êrîşên dewleta tirk li ser gundên sînorî yên başûrê Kurdistanê didomin. Ji ber êrîşên berdewam yên dewleta tirk xelkê van gundan tu rehetiyek ji xwe re nedîtine. Ji sala 1991'ê heta niha zêdetirî 400 gundên li deverên sînor ji ber êrîşên dewleta tirk vala bûne.

Bi êrîşên dawî ku artêşa tirk ji 23'yê nîsanê ve li ser xaka Başûr daye destpêkirin, jiyana şêniyên herêmê hîn zehmetir bûye. Şêniyên herêmê dibêjin ku ji ber hikûmeta Başûr tu alîkariyekê nade wan ji hikûmetê bêhêvî ne.

Welatiyên li gundên deverên sînor ji ber kiryarên dewleta tirk bêzar bûne. Herî dawiyê leşkerên tirk bi cilên leşkerî û çekên xwe daketin nava gundê Hirorê û ji gundiyan re gotin ku divê ew neçin ser rez û baxên xwe. Ger herin ew ê wan wek gerîla bi hesibînin û bombebaran bikin. Rojane şêniyên van gundan rastî gelek kiryarên bi vî rengî tên.

Ji ber kiryarên xirab ên leşkerên tirk a li gel şêniyên gundên deverên sînor, bi sedan gund vala bûne. Leşkerên tirk bi zanebûn rê nadin welatî debara xwe bikin û dixwazin wan di gundan de girtî bihêlin ku ji gundan dernekevin.

Şêniyên van gundan dibêjin ku bi salane wan gerîla li dora gundên xwe nedîtine, lê leşkerên tirk bi hincetên hebûna gerîla gundên wan bombebaran û dagir dikin. Tevî ku xelkên van gundan wisa dibêjin jî PDK û çapemeniya wê gerîla wek sedema êrîşên dewleta tirk nîşan didin û bi vî rengî dagirkeriyê rewa nîşan dayîn.

Çavkaniyekî ku serdana gundên sînor ên devera Kanî Masî, Avaşîn û Metînayê kir, li ser rewşa şêniyên van gundan lêkolînek kir û agahiyên xwe bi ajansa Rojnewsê re parve kir.

Li gorî çavkaniyê navborî artêşa tirk li herêma Heftanînê bi kûrahiya 12 kîlometreyan derbasî nava xaka Başûr bûye û gihiştiye gundê Keşanê. Li gundê Bankî Binê sê xaniyên welatiyan teqandine.

Li gorî van agahiyan, derdikeve holê ku armanca artêşa tirk valakirina gundan û koçberbûna xelkê gundan e.



Destar

Ehmed Pelda

# Teknolojiya şer rehberê şaristaniya şerxwaz e

Çêkirin û peydakirina amûrên şer hergavî pêşengiya hemû teknolojiyan dike. Ji destpêka merivahiyê heyanî roja îro, ev wek rêgezeke bingehîn hatiya hûnandin. Çi wextî merivên ewil li ser rûyê erdê destên xwe avêtibin kevirekî û ew firandibin, em dikarin bibêjin wê rojê yekemîn amûra şerê destpêkê jî afiriye. Her wiha wê rojê gel navgîna şer, ya çêkirina amûrên cuda jî daye destpêkirin.

Merivê rût û tazî û bênavgîn... ne dikare xwe biparêze, ne jî dikare xwarin û vexwarina xwe bi hêsanî peyda bike. Dema tenê bi komkirina çêreyê xwe têr dikir jî xwe nêzî keriyên ajalan yên çêrexur dikir. Her wiha ew jî wek keriyekî komî dimeşiyan û ji ber ku hebûna komî hêz dida wan da xwe li dijî dirindeyan biparêzin. Rawirên dir, êrîşkar û goştxur her gav keriyên çêrexur raçav dikin. Li ku sewaleke tenê mayî bibinîn êrîşê wê dikin ku piraniya wan jî virnî û bêezmûn in, birîndar, kulek in, an jî nexweş û bêtaqet in.

Lê merivahî ji zindiyên din cudatir in. Berî her tiştî serwext û secih in. Her çiqasî wek dirindeyan diran, an jî neynik, niçik xurt nebin jî hişê xwe bi kar tînin û vê kêmasiya xwe bi saya bikaranîna navgînan telafî dikin. Kevir û şiv wekî navgînên herî xav û destpêkê tên xweyîkirin. Ji ber ku bi hêsanî dikarî kevirekî hildî û bifirînî. An jî şivdarekî bigirî û li hember rawirekî ba bikî û heya bigire lêxî, ji xwe dûr bixî. Piştra şimşatkirina kevir, tûjkirina dar gavek din e. Lê bi bendan girêdana dar û kevir ku wek çakûç an jî tîr hatiye hûnandin, em dikarin wekî makîneya nû, teknolojiya destpêkê binasînîn. Ji ber ku amûrên cuda bi hev ve kirine û pê alaveke nû û bi xwedan erkekî taybet çêkirine.

Piştî vê karibûne li hemberî mar û mişkan, teyr û tûyan, gur û şêran xwe biparêzin. Ji keriyên çêrexur jî veqetiyane, berê xwe dane herêmên cuda bi cuda û deverên cîhanê geriyane. Mirovahiyê piştî komkirin û xwarina çêreyan, bi saya navgînan dest bi kuştina heywanan, lêdan, hûrkirin û parçekirina laşê wan kirine. Goşt xwarine, hestî kirine parçeyekî navgînan, çerm jî wek cil bi kar anîne.

Dewsa rewşa metirsî û xweparastinê pêvajoya êrîşkarî, desteserî û xweseriyê dest pê kiriye. Ango kes, kom, navgîn û amûran hev temam kirine û riya geşedana şaristaniyê vekirine.

Nîşana merivê şareza ji çêkirinê tê. Çêkirina navgînên xweparastin û êrîşkirinê, an jî amûrên hilberîn û berxwarinê derdikevin pêş. Lê kedîkirina sewalan, bikaranîna hêz, hirî, çerm, goşt, adan û dûmahikên wan gaveke cuda ye ku destê mirovan xurt dike. Saya vê yekê êdî koçberiyê cihê xwe daye bicihbûyînê ku heke koçberî hebe jî di nav herêmekê da li gor pêdiviya heywan û merivan di navbera çiya û zozanan, germahî û deştan de pêk hatiye. Ango terka welat êdî kêmbûye. Lewma çêkirina xaniyan, dirûtûna cil û bergan, çandina zevî, bax û bostanan pêş ketiye.

Lê belê pêşketina her civakê, her herêmê ne wek hev bûye. Şêniyê cih û warên cuda bi cuda xwedî taybetiyê cure bi cure bûne. Gava ku ev li hev qelibîne wek biyaniyên hev û wek dirindeyê hev dîtine. Her wiha di nav yek civatê de mijara parvekirina kar, xebat, berhem û tiştan ne wek hevbûye. Kesên xwedan hêz, kesên zana, kesên rûspî, kesên zarok û lawaz, rewşa jinanî û mêranî ji hêla aqilmendiyê, zanînê, parvekirinê, serweriyê û bûye mijara fikirîna cuda, daxwaziyên cihêreng, nakokiyên dijber.

Wer tê xuyanê ku rewişta merivahiyê qalikê xwe guhertiye, şerê merivan yê hember ajal, sewal û dirindeyan qalibê xwe guhertiye. Şerê merivan veguheriye li hember merivan, merivahiyê. Vê rewşê çêkirina armanca alav, navgîn û amûran jî li gor şert û mercên nû qulibandiye. Metirsî, êrîşkarî, pevçûn, şer, wêrankarî, desteserî ya li hember hev stunên cudaxwaziyê jî zêde kiriye.

Şêniyê şareza bûye hostayê çek û sîlehan. Çi ji wir hîn bûbe pişt re jî bo kelka gel bi kar anîne. Mîrkut mînanî çakûçê şer e. Tîr û hewan mînanî stunên xanî û baniyan in. Kevrî qîj û tûj mînanî das û kêr û tirpanan e. Li wir jî nemaye, kesên serwext liv, ger, tevger û fira rawiran jî raçav kirine. Pê re jî xwestine wek wan bin û taybetiyên wan ji xwe re bi kar bînin. Dewsa ga û hespan, erebeyên bar û seyareyên merivan dibin û tînin cuda bi cuda hatine çêkirin. Dewsa tîr û kevanê gulle, fuze top û tivingan cih girtiye. Lê belê ew fuzeya ku ji bo serkeftina şer hat bikaranîn, di dema îroyîn de xizmeta çûyîna fezayê dike.

Xwezî û xwezî, rikeberî, dijberî, dijminahî di navbera merivan de hîç pêk nehata. Belê rast e gelek navgînên îroyîn, sazî û dezgehên niha, rengê çanda em dorpêç kirine wê hîç nebûya. Lê belê ew nayê wê wateyê ku merivahiyê bê navgîn, bi amûr bimaya. Na, her merivek xwedî vînekê ye ku daxwaz dike, xwedî hişekî ye ku dihizire, xwedî dest û piyan e ku pê hilberînê dike. Elbet van taybetiyên xweser dê li gor çanda xwe riya hin navgînên cuda vekira. Belê şaristaniyê cuda bûya lê cudatî niha jî lazim e.

# Binyadgerî û qanûna metnên edebî

Sîpan Adar

Dahênerê teoriya binyadgeriyê zimannasê Swîsrî Ferdînand de Saussure (Fêrdînand do Sasur) (1857-1913) e. Bingeha teoriya binyadgeriyê, xwe dispêre Xebatên Saussure yên li ser zimannasiyê. Nîşeyên dersên Saussure yên ku li Zanîngeha Cenevreyê didan, ji aliyê xwendekarên wî ve wekî pirtûk hatine amadekirin û bi navê ***Dersên Zimannasiya Giştî*** di 1916'an de hat weşandin. Saussure bala xwe daye ser zimannasiya berawirdî û xebatên xwe di vê çarçoveyê de pêş xistiye. Saussure şiyana zimên li ser du xalan dabeş dike: Ziman (langue), gotin (parole).

Li gorî Saussure ziman, yek bi yek bi mirovan re eleqeder nîne, ew bûyerek e ku bi civaka giştî re eleqedar e; pergaleke ji ser takekesîbûnê re ye, razberbûn e. Diyardeyeke civakî ye. Gotin jî girêdayî hilbijartinên mirov ên şexsî pêş dikeve, bêtir şênber e, wezîfeya ragihandinê ya di navbera kesan de derdibire.


Her wiha Saussure li ser helwesta zimanzaniyê jî dabeşkirinekê dike û diyar dike ku du awayên nêzîkatiya zimên heye. **Awayê Diakronîk:** guherînên ziman ên li gor perîyodeke dîrokî. **Awayê Senkronîk:** nirxandina ziman li gorî heyama wê.

Ev her du têgeh dijî hev nînin. Di eslê xwe de li ser heman bingehê ne. Saussure jî bi piranî lêkolînên xwe li ser ziman kirine. Ango ji gotinê bêtir binyada ziman a giştî bûye mijara lêkolînên wî. Saussure dixwest ku pergala ziman derxîne holê. Lê nêrîn û ramanên Saussure ji teref formalîstên (teşeparêz) ûris ve hatine pêşxistin. Civata Zimannasiyê ya Moskovayê bi pêşengtiya Roman Jacobson û Vîktor Şikolovskî ve di sala 1915'an de hat damezirandin. Civatê dixwest ku hînbûyîn û elimînin heyî yên di qada edebiyatê de birûxînin. Bêguman helbesta sembolîst û ya fitûrîst a ûrisî û ramanên Saussure li ser teşeparêzan kar kir.

Teşeparêzên ûris li şûna ku ber û bala xwe bidin helbestvan û nivîskaran, li ser metnê kûr bûn. Ango wan yekser berê xwe dan metnê û nirxandinên xwe yên edebî di çarçoveya ziman û teşeyê de bi pêş xistin. Teşeparêzan wiha dipirsî : "Ojeya edebiyatê çi ye?", "Cudahiyên di navbera zimanê edebî û zimanê zanistî de çi ne?"….û hewl didan bi van pirsan, ji edebiyatê re û nirxandinên edebî re sînorên şênber destnîşan bikin. Pênaseyeke giştî ya ji bo binyada metnan. Li ser vî esasî dixwestin rêbazeke nirxandinê çêbikin. Diviya ev rêbaz li gorî hin rêgezên diyarkirî bûya û bi awayekî xweser tevbigeriya. Bi ya wan êdî dê bikaribûna kêm-zêde bi rêbaza ku bi dest xistine hemû metnên edebî binirxînin.

Em dikarin bibêjin ku rêbaza binyadger li ser van esasan pêk hat û geş bû. Bi saya serê dibistanên zimannasiyê pêş ket û di salên 1960'î de li Ewropayê bû yek ji rêbazên herî meşhûr ên nirxandina edebî. Kesên wekî Roman Jacobson, Tzvetan Todorov, Gerard Genette bûn pêşengên navdar ên vê rêbazê û tim hewl dan ku rêbazê bi pêş bixin. Heta Jakobson bû sedem ku rêbaza binyadger di warên cuda de jî bê tetbîqkirin. Lewra Jakobson ji derûdoreke zimannasîyê ya li Moskovayê derketiye û çûye derdora Dibistana Zimannasiyê ya Pragê. Ji wir jî çûye Amerîkayê û bandor li ser Claude Lévi Strausê (Klod Lêvî Strosê) antropolog kiriye.

Çak e, binyadgerî çi ye? Berî her tiştî divê em vê bibêjin: Binyadgerî teoriyeke navend-metnî ye. Yanî çi? Binyadger xêncî metna edebî (li ber dest) serê xwe bi tu tiştî re naêşînin. Ne jiyan û derûniya nivîskar, ne paşxaneya dîrokî ya metnê, ne jî cîhana derveyî metnê wan eleqedar nake. Ji bo wan metn bi naveroka xwe ve besî wan e.




Teorîsyenên binyadger ji bo vê fikra xwe, mînaka kişikê didin. Li gorî vê yekê, ji bo merivek kişikê bileyîze, ne hewce ye bizanibe ka lîstika kişikê kîngê û li ku derketiye holê. Kesek li du lîstikvanên kişikê binihêre dê bi xwe berê, bikaribe ji lîstikê fehm bike, hînê lîstina wê bibe. Qe nebe jî dê bizanibe ku peya çawa dileyîze, ferzîn çawa tev digere.

Binyadgerî, li ser hin rêzik û rêgezên ku di bin binyadeke edebî de veşartî ne, radiweste. Li pey bidestxistina pergaleke giştî ye. Ji bo wan ya girîng ew e: Hêmanên di pergalekê de, bi tena serê xwe tu wateyeke wan tune ye, tiştê ku wan watedar dike pêwendîya wan a bi hev re ye. Lewra li gorî wan berhema edebî diyardeyeke hevgirtî (temam, yekûn) ye ku bi xwe têra nirxandin û dahûrandina xwe dike. Ji vî alîyî ve wekhevî di navbera Binyadgeran, Formalîstên Rûs û Rexneya Nû de heye.

Yek ji teorîsyenên ku li ser geşedana binyadgerîyê xwedî rolekî taybet e Gerard Genette ye. Genette xwest bi rêbaza binyadger, yek ji berhemên herî kompleks ên serdemê, *Li Pey Demeke Winda* ya Marcel Proust binirxîne. Heta wê çaxê jî binyadgeran çîrok û vegêranên polîsiye ji xwe re dikirin mijara xebatê. Lê Genette bi hin têgeh û nêzîkatiyên xweserî xwe, berê xwe da berhema Proust û nîşan da ku bi rêbaza binyadger berhemên herî dijwar jî dikarin bên nirxandin.

Todorov jî bi xebata xwe ya bi navê Rêzimana Dekameron (*Grammaire du Decameron*) "gramera"(binyada) çîrokên Bocaccîo derdixe holê. Binyadger yeko yeko li dû dahûrandina berheman nakevin, şûna wê pergaleke giştî di berheman de peyda dikin. Bi rêya wê pergala giştî jî li ser binyada berheman kûr dibin. Vîladêmîr Propp, Greimas û Todorov mînakên van pergalên giştî dane. Ser meselê Propp li ser çîrokên gelêrî, 31 fonksîyonên giştî tespît kiriye û îdia dike ku ev fonksiyon ji bo piraniya çîrokên gelêrî derbasdar in.

Meriv dikare vê yekê bibêje; ji ber ku teorîsyenên binyadger, li pey pergaleke giştî dikevin, di nirxandin û dahûrandinên wan de, nêzikatiyeke kêmmayî derdikeve meydanê. Ango rexnegirê binyadger li pey pergaleke wisa ye ku dixwaze bi wê pergalê hemû berhemên edebî dahûrîne. Te dî, ew têgihiştina ku digot, "edebîyat jî hilberîneke zimanî ye" û divê bi metodên zimannasiyê berhema edebî bê nirxandin li Fransayê rê li ber gelek metodên nû kir. Postbinyadgerî jî li ser vê xetê ava bûye û bi veguherandineke pêwîst hewl da ji xwe re pergaleke nû peyda bike.

# Pirsgirêkên global û civakî ya sedsala XXI



Kurdistan Lezgiyeva

*"Avahiya zanînê ya pergala cîhana kapîtalîst bi qasî hêz û amûrê hilberîn-berhevkirinê di krîzê de ye. Ji ber cewherê avahiyên zanînê, ew bêtir ji nîqaşa azad re mebest in, li ser pîvanên krîza zanistî şirovekirinek hewce dike. Di civakê de û avahiyên hêzê de rola zanînê dikare wateyek bi rengekî ku bi tu serdemek din re nayê qiyas kirin bibîne. Amûrên agahdarî-înformatîk ên jiyana civakî şoreşek dîrokî jiyan dikin. Di pêvajoyên şoreşgerî de bi esasî rola lêgerîna rejîmên heqîqetê dilîzin. Hegemonya ne tenê di warên berhevkirin, hilberîn û hêzê de cih digire; Têkoşînên hegemonîk ên tund di qada zanînê de têne şahidî kirin. Tu sazûmanîyeke hilberîn-berhevkirinhêzê, ku di warê zanînê de rewabûn peyda nekiribe, nikare hebûna xwe ji bo demeke dirêj mayînde bike".*

***Abdullah Ocalan***

Pirsgirêkên civakî her dem yek ji mijarên herî giran ên çalakiya zanistî ya mirovî bûne. Civakek çiqas zû pêş bikeve, pirsgirêkên bi vî rengî yên berbiçav xwe diyar dikin, her sal pîvan her ku diçe mezintir dibin. Bi taybetî bandora xurt a pirsgirêkên civakî li ser civaka cîhanê di sedsala 21'ê de bi dest xwe xistiye. Pêşketina teknolojîkî gihiştiye asta xwe ya herî bilind. Ev bû sedem ku di navbera hin welatan de, hem ji hêla aborî hem jî ji hêla civakî ve, berevajîbûneke berbiçav peyda bûye ku ev bû sedema pirsgirêkên civakî yên cîhanî yên nû.

Îroroj pirsgirêkên civakî yên wekî krîza aborî, globalîzm, nifûsa zêde, koçberî, terorîzm xwe bi zelal nîşan daye.

Pirsgirêkên civakî heya ku mirov hebin dê hebin. Çiqas civak ango mirov fam dike, ewqas bilindtir dibe gavên pêşketinê, pirsgirêkên civakî jî aloz û piralî dibin. Heya sedsala 19'an, ew di xwezaya xwe de bûn, lê belê, bi saya pêşveçûna teknîkî û du şerên cîhanê di sedsala 20'î de, mirovahî bi encamên çalakiyên xwe re, ango derketina pirsgirêkên civakî yên cîhanî re rû bi rû ma.

Divê were zanîn ku di lêkolînên zanistî de têgeh û navnîşeke pirsgirêkên civakî yên cîhanî tune ye, ji ber vê yekê, pirsgirêkên takekesî di nav yên gelemperî de têne kom kirin. Di heman demê de, girîngiya pirsgirêkên civakî yên cîhanî her gav diguhere. Tevî rastiya ku gelek pirsgirêkên civakî bi pratîkî venegerin, girîngiya wan di van salên dawî de pir kêm bûye, li şûna wan pirsgirêkên din ên ku hewce ne di pêşerojeke nêz de bên çareserkirin derketine.


Em dikarin bê dawî li ser pirsgirêkên civakî biaxifin. Di sedsala 21'ê de, li gelek deverên cîhanê, mirov ji ber birçîbûnê jiyana xwe ji dest didin. Ango, mercên herî hewce ji bo zindîbûnê jî li wir tune ne. Ji hêla mirovahiyê ve destûra vê tê dayîn. Bi hezar salan hebûna şaristaniyan hêzeke bêhempa bi dest xwe xist û di teorî û pratîkê de depoyeke mezin a zanînê berhev kir. Wekî ku hûn dibînin, kapasîteya (an xwesteka) mirovahiyê ku bi kêmanî çavkaniyên bingehîn belav bike pirsgirêkek e.

Li ser pîvanên cîhanî -siyaseta dewletên ku tenê berjewendiyên xwe diparêzin, li gelek welatan rejîmeke otorîter, nifûsa zêde ya global bi hemû encamên pê re, dîsa; dabeşkirina bêaqil a çavkaniyan, şer û teror, zexta olî, bêaramiya aborî ya bêdawî heye. Lê belê, pirsgirêkên mayî jî dikarin bi pirsgirêkên cîhanî re bêne vegotin. Li piraniya welatan -li her deverê bi awayên cuda, li cihekî bêtir, li cihekî kêmtir -bêkarî, alkolîzm, eroîn, nexweşî, gendelî, taciz û tecawiz, kêmbûna exlaq; perwerdehiya bêbandor, binpêkirina mafên mirovan, paşketina çandî û hwd. Ev lîste dikare bê dirêjkirin, lê girîngtir e ku mirov li ser sedem û encamên wê bifikire.

Pirsgirêka rastîn a tevahiya mirovahiyê di hişmendiya wê de ye. Ji bo ku jiyana xwe bidomînin, pêş ve naçin, xwe û derdora xwe perwerde nakin, piştgiriyê nadin çandê û hunerê, berovajî vê yekê mirovahî her ku diçe xwe dixe quncikeke mirinê ya pirsgirêkên ku divê di zûtirîn demê de bên çareser kirin.

Mixabin, îro ji gelek pirsgirêkên civakî yên cîhanî re çareserî tune ye, lê ew ê bê guman di pêşerojek pêşbîn de xuya bikin. Lê belê, divê bi bîrxistin ku jiholêrakirina hemû pirsgirêkên civakî ne mumkun e, ji ber ku ew ê heya ku civak hebe wê hebin. Tenê tiştek ku em dikarin bikin ev e ku em hewl bidin ku pirsgirêkên cîhanî-global kêm bikin.

Ji bo vê yekê berî her tiştî pêwîst e hişmendiyeke nû ya gerdûnî bê afirandin. Her wiha perwerdeya kes û civakan li ser rêgezên humanîzmê, bi firehî li ser pirsgirêkên cîhanî mirovan agahdar kirin, lêkolînek berfireh a sedem û nakokî, mercên ku dibin sedema derketin û alozbûna pirsgirêkan û di afirandina teknolojiyên hawîrdorê yên herî nû de, navendeke cîhanî ya hevbeş ji bo lêkolîna pirsgirêkên gerdûnî, yek fona darayî û çavkaniyan û pevguhertina agahdariyê hevkarî pêdivî ye.






# Rehman û Rehîm

Zilam êvarê diçe mala melê gund û ji mele re dibêje: "Seyda tu dikarî îşev devê guran girê bidî? Çêleka min wenda bûye ji bona ku gur wê nexwin!"

Seyda dibêje: "Xweda rehman û rehîm e li çêleka merivan jî xwedî derdikeve, ne hewce ye ku ez devê gur girê bidim."

Zilam dibêje: "Çi dibe û çi nabe dîsa jî tu devê gur girê bidî baş e!"

Mele devê gur girê dide û ji zilam re dibêje: "Aram be, wa ye min devê gur girê da, hindîna ne çêleka te, wê nikaribe avê jî vexwe."

Zilam diçe mal û sibetirê diçe li çêleka xwe digere, dinihêre ku wayê du heb gur ketine ser çêlekê û gurek çêlekê vir de dikişîne û yê din jî wê de dikişîne.

Zilam piştî ku vê rewşê dibîne vedigere tê malê û leqayê mele tê. Mele dibêje: "Cîran te çêleka xwe dît ne wisa?"

Zilam dibêje: "Belê seyda, min çêleka xwe dît!"

Mele dibêje: "Min ji te re negot Xwedê kerîm û rehîm e, li çêleka merivan jî xwedî derdikeve, tu yê çêleka xwe bibînî!"

Zilam dibêje: "Rast e, Xwedê bi navê kerîm û rehîm du heb gurên xwe şandibû ser çêleka min û lê xwedî derketibû, rehîm wê virde dikişand û rehman jî wê de dikişand lê xwedî derketibûn" û axaftina xwe didomîne, dibêje "seyda tu ji dêlva devê gur girê bidî te lingê çêleka min girê daye, hîn tu nizanî devê gur û lingê çêlekê ji hev derxî û tu hatî li pêşiya min nimêj dikî!"

*Riza Uyar*

# Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok 2 zûgotinokên nû hene û em ê dîsa bi we hêjayan re parve bikin.

De werin em dest pê bikin û pirsa xwe ya her carê bipirsin.


→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bêje:
**Qerê qeraşê aşê**
**qeraşîkê li qeroyê miqrî ye**

→ Heke nikaribî wê bêjî ka vê biceribîne:
**Deziyê derziya terzî pizî hîvaz**

***Çavkanî: Mamoste Salihê Heydo***



# XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

3. Ji nişkan ve 5. Cînavkeke xwerû ya pirhejmar 7. Exlaq, her wiha navê darekê.....
8. Noteke mûzîkê 9. Tîna agir 13. Kovareke bi zaravê kirmanckî
14. Arvan, genimê hêrayî 16. Erdê beyar, erdê ne çandî
19. Wêran, xirab 20. Cînavkeke yek jimar tewandî
21. Alaveke ji bo kolana erdê 22. Vexwarina sereke ya zarokên biçûk.
25. Ji bo 26. Navçeyeke Agiriyê 28. Helbestkarekî kurd seydayê.....

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Nêçîrvan, masîgir
2. Fêkiyekî havînê
3. Kurteya elementa Aktinyumê
4. Roja em tê de
6. Tekoşîna gelan a ji bo bidestxistina mafên xwe
10. Îrade
11. Îşaret, şop
12. Roj
15. Sewalekî çolistanê yê mînaka sebir û tehemûliyê
17. Xwecih
18. Dema ku agir bi deverekê dikeve
20. Alava ku pê rêstin tê kirin
23. Tav
24. Bajar
27. Dayik

Bersiva hefteya borî





Kewê Redkan

# Pamedorên me (Firingî)

A niha ez li malê rûniştime li benda gulîdirêjê sekinîme, (Navê wê Gulxan e, ji ber guliyên wê dirêj in em bi navê gulîdirêj gazî wê dikin. Ne ewqasî bedew e jî hema wisa). Gulîdirêj, ew jî weke min bi tena serê xwe dijî, zarokên wê mezin bûn, dûre her yek li pey karekî terka mala xwe, gundê xwe û dayika xwe kirin. Lê her tim ez û wê hevaltiyeke pir baş dikin. Kengê alîkariyekê ji min bixwaze wê gavê ez diçim hewariya wê, ew jî ji min re wisa ne; tu carê terka min nake, hema em bêjin xwarin û vexwarina me yek e.

Xaniyê min ji yê wê mezintir e, li ber derê xaniyê min erdekî mezin, di nav de gul û sosin, dar û daristan hene. Yê wê, tenê li ber derê wê erdekî biçûk heye, ew jî tenê têra gera mirîşkên wê dike, wekî din bi salan e, di kêleka mala min de ji xwe re bostan diçîne, di nava wî bostanî de hemû cureyên şînahiyê hene. Dema destpêka havînê îca ew bostan weke bejna me bilind dibe, em nikarin di nav de bigerin. Îsal jî bereketa wî ji hemû salan zêdetir bûye. Her roj an ez, an jî Gulîdirêj bi saetan avê didin wî bostanî, haaa av jî ava min e, ew av jî li herqa kêleka mala min diçe ser bostan. Duh min got; Gulîdirêj, ez dixwazim hinek ji wan pamedorên şîn bidim hev, ji bo bikim tirşîn, tirşîna wan pir xweş e, nîvek ez û nêviyê din jî tu?

Gulîdirêjê xwe gizgizand, di devê xwe de bir û anî û got: "Na, ez naxwazim tu wan pamedorên şîn bikî tirşîn, bila hinekî sor bibin paşê em ê biryara xwe bidin." Min hewl da ku bipirsim gelo çima naxwaze? Hema vir de û wê de peyv ji devê wê derket û got: "Ez dixwazim van pamedoran hemûyan bifiroşim, ez ê bikevim nava bazara firotinê, min biryara xwe daye, her sal ez ê vî karî bikim. Min dengê xwe dernexist lê ez hinekî êşiyam. Erd erdê min e, av ava min e, sibê heta êvara dereng ez li der û dora wî bostanî diçim û têm, nahêlim çûkek xwedê jî gavê xwe bavêje nava wî bostanî, lê Gulîdirêja me naxwaze ez hebek pamedor jî hildim ji xwe re. Min got: "Baş e, bazara te li ser xêrê be, bawer bike ez êşiyam, lê ger tu dibêjî ez ê ji xwe re qezencê bikim, tu gotineke min tune." Di navberê de çend roj derbas bûn, ew pamedorên di nava bostan de sor sorî û mezin bûne, meriv nikare ji ber bêhna wan nêzîk bibe, gelo tama wan jî wek bêhna wan xweş e an na?

Min dît wa ye Gulîdirêja me, û Resoyê dikandar di nava bostan de digerin, piştî demekê Reso bi wan dest û lepên xwe yên qelişî kete nav bostan û ew taromaro kir, dema ew çû te digot qey gamêşekî reş ketiye nava wî bostanî, bostan xil û xera bibû. Ew dem ez jî malê derketim çûm mala cîranekê xwe ya din. Ber bi êvara dereng, min dî waye Gulîdirêja me di nava bostan de rûniştiye, destê xwe di nava wê axa tar û maro bûye digerîne û bi aliyê din ve jî digirî. Ez çûm, cem rûniştim, min got: "Negrî xwanga min, te dixwest tu vî bostanî bifiroşî, niha te firot, lê çima bi şewat digirî?" Got: "Wî bostanê me ji hev de xist, qurişek pere jî neda, dibêje pamedorên te rizyabûn, min zerar kir." Min got: "Baş gotiye, ew di ber lepên wî yên qelişî de riziyan. Lê sala pêşiya me ez ê vî bostanî daynim, ger te xwestiye ji xwe re vê kêleka hanê de bostanekî deyne, lê ez careke din naxwazim ew Resoyê destqelişî gava xwe biavêje vir, tu him hevala min û him jî cînara min î, rabe, em îsal tirşîna pamedora çênekin jî dibe..." Heyfa min li pamedoran û hêsirên Gulîdirêjê hat, her du jî çiqas guneh bûn.

# Kesayetiya mêtingehê û hunermendên mêtingehê



Îlham Bakir

Mêtinger dema ku hebûna binerd û serxerd ya gelekî, dewlemendiya dîrokî û çandî ya gelekî talan dike; dema ku li ser gelê mêtingeh bernameyeke dagirkirin û venêranê pêk tîne, gelên heremê yên ku li hemberî vê yekê derdikevin rastî zordestî û tundiyeke dijwar tên. Ev tundî û zordestî ne tenê ji bo cezakirin û şikandina îradeya ku li ber xwe dide ye. Ev tundî û zordestî di heman demê de ji ber ku dagirkerî û venêran bidome, bê pejirandin, rewa bê dîtin û bişaftin pêk bê tê çêkirin. Ji ber vê yekê jî divê giyan û mêjiyê kesên mêtingeh bên berovajîkirin û bibin mêtingeh.

Frantz Fanonê ku li ser mijara kolonîzasyon û psîkopatolojiya kolonîzasyonê bîrewerê sereke yê sedsala 20'emîn e dibêje ku mêtingerî tenê ji aliyên aborî û polîtîk ve pêk nayê. Mêtinger, psîkolojiya mirovên mêtingeh hildiweşînin, wan ji zimanê wan, ji çanda wan, ji awayê jiyana wan re dikin biyanî. Mirovên mêtingeh, bi rêya vê biyanîbûnê bi dildarî xizmeta polîtîkayên mêtingeriyê dikin. Taybetiya tîpîk a mirovên mêtingeh ya herî berbiçav ew e ku ji aliyê giyanî û ramanî ve xwe wek kesekî/e ji çanda mêtinger dibîne. Kesera dilê mirovê/a mêtingehê ew e ku li ber çavên mêtinger xwedîrûmet be, xwe bide pejirandin, ji aliyê wî/ê ve bê erêkirin û bikaribe wek wî/ê bijî.

Hunermendên mêtingehê ji nexweşiyên mirovên mêtingehê azade nînin. Heta ev nexweşî ya li ser hunermendên mêtingehê ji mirovên ji rêzê yên mêtingehê qat bi qat zêdetir in. Li hemberî çanda mêtinger xwe biçûk dibînin, pêşketina xwe, qayilbûna ji xwe, hilberîna xwe bi pîvanên mêtinger dipîvin, nirx û pîvanên mêtinger esas digirin, xwe bi mêtinger re muqayese dikin: Ev taybetiyên sereke yên hunermendên mêtingehê ne. Hunermendê/a mêtingehê, ji bo hilberînê, motîvasyona xwe ya herî mezin ji ecibandin û erêkirina otorîteyên hunerê yên mêtinger distînin. Pîvana ecibandin û erêkirina otorîteyên mêtinger ji çanda xwe dûrketin, biyanîbûn û şibîna çanda mêtingeran esas tê girtin. Ji bo pêşketina hunera xwe, ji bo çawaniya hilberîna xwe ecibandin, erêkirin û xelatkirina herî biçûk a ku ji aliyê otorîteyên hunerê yên serdestan ve bê kirin hunermendê/a mêtingehê vê yekê ji bo xwe wek rûmetek û nirxeke pir mezin dibîne, bi vê yekê şad dibe. Ji aliyê din ve erêkirin, ecibandin, xelatkirin, pesindayîna ku aliyê sazî, organîzasyon, rêxistina çanda xwe ve tê kirin ji bo hunermendê/a mêtingehê ne rûmetek e, heta asta hunera wî/ê dadixe.

Keseyatiya hunermendê/a mêtingehê kesayetiyeke parçekirî ye. Tu caran nikare bibe xwediyê helwest û seknekê û şîrovekirineke temam. Girîngiyê nade sazîbûn û rêxistinbûnê. Sazî û rêxistin li gor wî/ê li hemberî azadiya huner û hunermendan astengiyên pir mezin in. Redkirina sazîbûn û rêxistinbûnê di esasê xwe de redkirina civakîbûnê ye, ji bo berjewendiya çand û hunera endustriyalîzmê dixebite. Civak li hemberî kapitalîzm û endustriyalîzmê bi sazîbûn û bi rêxistinbûnê tê parastin. Mêtinger dixwaze di navbera tiştên ku civakîbûnê derdixin holê û hunermendan de nakokiyan pêk bîne. Hunermend dema ku nabîne, pê nahese yan jî ji nedîtî ve tê ka çawa hemû berhemdariyên wî/ê yên hunerî, hemû hilberînên wî/ê, di nav diranên çerxên endustriyalîzmê de tên hêrandin; dibêje ez azad im û bi bijiyeke mezin bêalîbûna hunerê diparêze. Ev tişt jî nîşaneyeke aşkere ya rûxandina hişê wî/ê, ji xwe dûrketin û biyanîbûna wî/ê ye. Îro bi qasî hunermendên kurd, tu derdorên hunerê, tu hunermend behsa bêalîbûn, azadbûn, serxwebûna huner û hunermendan nake. Lewra ji bilî hunermendên mêtingehê her kes pir baş dizane ku bêalîbûn, alîgir nebûn ji derveyî derew û tirhêweke mezin tu wateya xwe tune ye. Bêguman hunermend muxalîf e, dijber e. Bêguman mineta tu koma îktîdarê helnayîne. Lê tu caran hunermend nakeve, nikare bikeve nav dijbertiya civaka xwe. Hunermendê/a mêtingehê ji aliyekî ve heta mûyên canê xwe girêdayî organîzasyon û rêxistinên mêtingeran in, ji dewletê alîkarî û piştgiriyê werdigirin ji aliyekî ve jî xwe azad dihesibînin; ev jî nîşaneya kesayetiya parçebûyî ya mêtingehê ye. Hişê xwe tevlihev, rastiya xwe berovajî kiriye. Desthilatdar ji bo ku bikaribin polîtîkayên xwe yên mêtingeriyê bidomînin, bikaribin zêde bikin rêxistin û saziyên dêwendam pêk tînin. Hunermendê/a mêtingehê ji bo tevlîbûna wan organîzasyonan ji sibê heta êvarê li ber deriyê van sazî û rêxistinan wek parsek li benda para xwe disekine lê ji aliyekî ve jî sazî û rêxistinên ku li dijî mêtingeriyê hatine sazkirin wek totalîter û zordest îlan dike, li hember hunera azad wek astengiyekê dibîne.



Hunermendê/a mêtingehê, cihê ku herî zêde ku xwe bi mêtinger re nîvekar dibîne xwe li ba mêtinger dikare bide pejirandin û zimanê hevpar ê ku li dijî siyasetmedar û hunermendên civakparêz bi kar tîne bi xwe ye. Mêtinger vî zimanî saz dike û hunermendê/a mêtingehê jî dibe parçeyekî vî zimanî û bi vî zimanê dikare bişibe mêtinger, pê re bibe yek. Mêtinger herî zêde ji bo vî zimanî hunermendê/a mêtingehê teqdîr dike, pesnê wî/ê dide. "Rewşenbîra/ê" çanda mêtinger dema ku çanda mêtingehê dinirxîne, bin pê dike, biçûk dibîne û pir bi baldarî tevdigere. Dibe ku ji ber vî zimanî di nav rewşenbîran de bi nijadperestî, bi faşîstî bê tawanbarkirin. Lê ev binpêkirin û bêrûmetkirin ji aliyê hunermendê/a mêtingehê ve bê ziman an jî di nav berhemên wî/ê de cih bigire ev dibe xwerexne, ev dibe şîroveya objektîf a li ser xwe. Bi vî awayî mebest pêk tê. Him çanda mêtingehê tê binpêkirin him jî rewşenbîra/ê mêtinger rastî tawanbariya nijadperestiyê nayê.

# Sê pirtûkên li ser dengbêjiyê

Weşanxaneya Na'yê di bin rêzepirtûkên dengbêjiyê de sê pirtûkên li ser dengbêjiyê çap kirin. Naveroka sê pirtûkên ku bi hev re derketine, dengbêjî ye û her sê pirtûk jî rola dengbêjiyê ya di nav civata kurdan de dide nîşandan. Ji van pirtûkan yek bi zimanê dengbêjekî, bi kelam û kilama Dengbêj Şakirê Kopê hatiye nivîsandin. Her du pirtûkên din jî bi nêrîneke zanistî li ser dengbêjiyê hatine nivîsîn.

**Şakirê Kopê**

'Jiyan û Berhemên Min' pirtûka Dengbêj Şakirê Kopê ye. Ev berhem yekem pirtûk e ku dengbêjekî bi xwe nivîsiye û çap kiriye. Pêşnivîsa vê pirtûkê ji aliyê Canser Kardaş ve hatiye nivîsin.

Şakirê Kopê di vê pirtûkê de behsa bîranîn xwe û yên dengbêjên nav kiriye ku yek ji van dengbêjan Dengbêj Şakiroyê navdar e. Her wiha Şakirê Kopê di pirtûkê de çîrokên kilaman jî nivîsandiye. Şakirê Kopê bi tenê kilamên bi gotina xwe di vê pirtûkê de nenivîsiye, wî berî her kilamî behsa rûdan û naveroka kilaman kiriye. Li gorî bihîstina wî bûyer û sedemên derketina kilaman çi ne, wî xal bi xal aniye ziman.

Em dikarin bibêjin ku di vê meseleyê de bîra Dengbêjê me ji şerê bi Ûrisan re bigire heta çûyînên Elmanyayê, ji dewra Surmelî Memed Paşa û Evdalê Zeynikê bigire heta Derwêşê Evdî me digihîne gelek qewmên dîrokî û şahidiya demên berê dike. Bi vê pirtûkê xwendevan bi gotin û awaza dengbêjekî zindî dikeve nav asoya dengbêjiyê û digihîje tehma vê kevneşopiyê.

**Jin û dengbêjî**

Nivîskarê pirtûka bi navê 'Di Kilamên Şakiro De Îdealîzasyona Jinê' Kamuran Demir e. Nivîskar, îdia dike ku di kilamên Şakiro gotine de jin tên wesifandin û îdealîzekirin. Di vê pirtûkê de hêmayên li ser wesifandina jinan ên di kilamên Şakiro de hatine jêgirtin û bi çavkaniyên cûr bi cûr îdia hatiye piştrastkirin. Dengbêjî, Dengbêj Şakiro, Tehlîla Îdealîzasyona Jinê sê beşên sereke yên pirtûkê ne.


**Klamên Şakiro**

Çavên wan, bejna wan, porê wan; bi nêrîna xuyayî ve jin çawa hatine sembolîzekirin. Şar û şemaqiyên wan, timtêla wan, fistanê wan; wan çi li xwe kirine û bi giştî çi di destên wan de hene. Karakterên wan, tevgerên wan çi ne; dengbêjan wan şibandine çi. Di kilaman de ev hîm yek bi yek hatine tespîtkirin û şiroveya wan hatiye kirin. Her wiha tixûbên dîtin û teswîra jinan -bi taybetî- yên dengbêjiya Dengbêj Şakiro, -bi giştî- yên dengbêjiya kurdî hatiye xêzkirin.

**Pirtûkeke tirkî**

'Sosyolojîk Açidan Kurd Kulturunde Dengbêjlîk ve Dengbêjlik Geleneği' pirtûka Cebrail Kaya ya bi tirkî çap bûye ji sê beşên bi navê 'Ji aliye têgehê ve di kultura kurdan de dengbêjî', 'Ji aliye civakî ve çanda gotinê û çîrokbêjiyê', 'Ji aliye civakî ve di çanda kurdan de dengbêjî û kevneşopiya dengbêjiyê' pêk tê. **ÎZMÎR**







# Li Qamişlo Mihrîcana Kurteçîrokan



7'emîn Mihrîcana Kurteçîrokan bi diruşma "Çîrok bang e...xwenasîn û vedeng e" li Hola Zana ya Qamişlo dest pê kir. Mîhrîcana ku ji aliyê Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Sûriyeyê ve hatiye organîzekirin bi deqeyeke rêzgirtinê dest pê kir. Dûre muzîk û hin qeydên bidîmen ên nivîskar û hunermendên kurd ên li derve hatin pêşkêşkirin. Di qeydan de lidarxistina mîhrîcanê hat pîrozkirin.

Di mîhrîcanê de rewşenbîr, nivîskar û helbestvan, her wiha endamên saziyên sivîl ên Rêveberiya Xweser amade bûn.

Ji tevahî Kurdistanê 24 nivîskarên li gorî şert û mercên mîhrîcanê û li gorî peyama çîrokê beşdar bûn.

Mîhrîcan dê heta 5'ê vê mehê bidome. Dê di roja dawî de 3 xelat ji bo 3 kurteçîrokên herî baş werin dayîn.

Yekitiya Nivîskarên Kurd-Sûriyeyê ji 2014'an ve salane mîhrîcanê ji bo vejandina kurteçîroka kurdî li dar dixe.
***QAMIŞLO***

xwebûn

5-11 Tirmeh 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 81

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Kadri Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Elif Can Alkan
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 **Yenişehir / Diyarbakır**
**Baskı:** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85



Ayhan Erkmen

# Seyîdxan û Elîcan

Mem û Tajdîn, Siyabend û Qedê, birader in, bi bext in; tevan ji belayê re ferman xwendine. Sed sal berê Seyîdxan û Elîcan jî bi heman awayî, serî dane heman rêyê, birader in û bext in. Çarenûsê ji bo çareyê heya roja mirinê ew gihandine hev. Der barê biraderî, bext û egîdiya wan de dengbêjan bi dehan stran çêkirine.

Seyîdxan li herêma Mûşê ji gundê Qicix e, Elîcan jî li herêma Qereyaziyê ji gundê Hespreşê ye. Seyîdxan ji mala Ûsivê Seydo ye, Elîcan jî ji mala Bişar Axa ye. Qaçax û firarê destê Romê ne. Dengê rehmetiyê Apê Reso dû şopa wan dikeve.

*"Weylo weylo weylo...*
*Ez nemînim ji mêran re*
*Lêxin bavên bavên mino lêxin.*
*Canfidayê Mala Bişar û Seydo lêxin.*
*Nîşan bigirin, qundaxê tivingan li erdê xin..."*

**Malbateke serhildêr**

Bavê Elîcan, Hecî Axa li gel dewleta Osmaniyê, li hemberî Rûsan, li Milazgirê şer dike û tê kuştin. Elîcan bi xwe jî dema Mustafa Kemal alîkariyê jê dixwaze, yekîneyekê ava dike, li Çûkurovayê li hemberî Fransiyan şer dike. Di sala 1922'an de ji ber mêrkuştinekê tevî birayên xwe ve tê girtin. Ew di sala 1926'an de tê berdan lê Evdilbaqiyê birayê wî bernadin, ew jî ji kelehê firar dike û diçe digihêje serhildêrên Agiriyê.

Seyîdxan û birayên xwe jî dema şerê cihanê yê yekemîn de, li Kopê, li hemberî rûsan şer dikin û Dewrêşê birayê wan di vî şerî de tê kuştin. Seyîdxan jî wek Elîcan ji mêrkuştinê serê salên 1920'î heya sala 1926'an tê girtinê. Nasîna Seyîdxan û Elîcan bi vî awayî di girtîgehê de çêdibe.

Di dema serhildana Şêx Seîd de her du mêrxas jî ji dewa xwînê girtî ne. Dema ku tên berdan serhildan hatiye şikestin, jiyan li kurdan hatiye heramkirin, yên kuştî ji xwe kuştine yên mayî digirin û mişext dikin.

**Dişînin girtîgeha Amedê**

Ji ber wê Seyîdxan piştî ku tê berdan demekê diçe rojhilatê Kurdistanê, ba Smaîl Axayê Şikakî. Haja dewletê jê çêdibe. Jê dev tehl in. Di sala 1927'an de li herêma wî yazdeh leşker tên kuştinê û bi wê hincetê Seyîdxan cara duyemîn tê girtinê, wî dişînin girtîgeha Amedê. Apê Osman Sebrî wî li wir kurt be jî dibîne, wisa di bin heybeta wî de dimîne ku di pirtûka wî ya 'Çar Leheng' de lehengê duyemîn Seyîdxan e. Jê re deh sal ceza tê birîn, bê minet e, rûgeş e.



Seyîdxan bi alîkariya Evdilmecît Begê Sîpkî di nav çend salan de tê berdan.

Di sala 1930'î de dewlet ji bo serhildana Agiriyê bişikêne dora çiyayê Glîdaxê dipêçe. Ferzende beg ji bo piştgiriyê bigire û eniyê fireh bike dikeve nav liv û tevgerê tê heremên wan, bi Elîcan û Seyîtxan re hevdîtinan çêdike, dewlet bi bîhîstinê dixwaze wan bigire. Xwe nadin dest Elîcan bi çend kesan dikişe geliyê Berazan, Seyîdxan jî dikişe warê Kendalan.

**Ji bo dorpêçê bişikînin**

Li gorî ragihandinên Osman Sebrî, Qedrî Cemîlpaşa û Hesen Hişyar li herêma lê ne ji bo dorpêça Agiriyê bişkênin wek bendavê pêşiya leşkeran digirin û çalakiyan li dar dixin.

Elîcan bi yekineya xwe bi ser gundê Qulixa de digire. Çar leşker û sê gundî tên kuştin. Dema derbasî gundê Çepê dibe bi hêzeke sed û pêncî kesî ve tên ser wî, Elîcan ji wan pazdeh kesan dikuje. Pêncî leşkerî dîl digire, çek û cebilxana wan berhev dike, wan berdide. Bi ser Lîzê de digire li dû xwe kuştiyan dihêle û dikişe. Dema ku Elîcan li Dehlikê ye Seyîdxan Teyfîqê birayê xwe jê re dişîne, dixwaze hêza xwe bikin yek. Ji ser vê di serê payîza sala 1930'î de, di gundê Sêgiran de her du xweşmêr hêzên xwe digihînin hev. Hêza wan dibe pêncî, şêst şervanî.

**Elîcan tê kuştinê**

Dema li gundê Mela Xidiran in, bi hêzeke ji sed leşkerî zêdetir diavêjin ser wan, şerekî giran diqewime, ji leşkeran hema hema çaran yek tên kuştin, ji wan birîndarek heye. Seyîdxan û Elîcan diavêjin ser gundê Norkoxakê, dîl hene Medeniyê Hecî Musa Begê dîl digirin. Lê Medenî direve ji destê wan xelas dibe. Haja Medenî çêdibe ku ew li herêma Xaça Reş, di aqara gundê Wartaxê de ne. Ji leşkeran re xeberê dişîne xwe jî dide pêşiyê, tên ser Seyîdxan û Elîcan. Di vî şerî de "Siyarê Kulik, Bavê Mihemed Reşît" Elîcan tê kuştinê. Ew, Elîcan li wir dispêrin axê.

Bi kuştina Elîcan a bêwext re per û baskên Seyîdxan tên şikestin. Destebirakê xwe winda dike. Dil heye êdî xwe bigihînin çiyayê agiriyê. Lê leşker û mîlîs rê li wan dibirin, nahêlin derbas bibin.

**Mîlîs lap har in**

Diçin Qaz Goliyê, Geliyê Berazan, Çiyayê Bilîcanê, Gundê Melemistefayê, Qereyaziyê, Dutaxê û Cemalvêrdiyê. Dervîş Begê qatilê Geliyê Zîlan jî bi leşkeran ve li dû wan e. Lê ne bi tenê ew, mîlîs lap har in. Zekî Begê kurê Evdilmecît Begê mirovekî bi bext e. Der barê mîlîsan de wan hişyar dike, pir nakişîne di gundê Cemalvêrdiyê de şer diqewime, çend milîsên bijare tên kuştinê. Di vî şerî de piyê Mihê Xelîfe yê pizmamê Elîcan dişkê, wî bi şervanekî re di şikeftekê de bi cih dikin. Lê haja dewletê bi tewrekî çêdibe diçin, Mihê û hevalê wî digirin. Wan çend mehan di girtîheha Dutaxê de digirin, pey re dibin di aqara gundê Birûskê de dikujin.

**Navê newalê dibe 'Newala Xwînê'**

Dervîş Beg ji bo pişta serhildêran bişkîne, gefan li gundiyan dixwe, nahêle kes alikariyê bike. Leşkerên Miralay Alî Kemal bi navê din Kemalê Dînik bi ser gundên Seyîdxan de digirin û gundên Qicixê, Resûlayê, Sêgirayê, Heftmexeloyê, Bostankentê dişewitînin, di newala çêlekan de du mîtralyozan girêdidin û ji wan gundan çil û heft mêran dikujin, ji wê şûndatir navê newalê êdî 'Newala Xwînê' dimîne. Jin û zaran jî bi xwe re dibin.

Bi zivistanê re Seyîdxan bi jin û zaran berê xwe dide binxetê. Leşker û mîlîs bi belediya Emînê Pêrîxanê di Çiyayê Narikê de pêşiya wan dibirin. Bi jin û zar in, naxwazin bikevin şer. Şêxê Dûderiya stariyê wan dike; jin û zaran li ba wî dihêlin, xwe jî wê zivistanê di çiyayê Sasonê de derbas dikin.

Bi biharê re diavêjin ser çend gundan û çend mîlîsan dikujiin. Dema li Çiyayê Bilîcanê ne Derwîş Beg bi hêzeke 300 siwarê tê ser wan. Çavê wî şer naxwe. Qasidekî xwe dişîne ba Seyîdxan ku bila teslîm bibe. Seyîdxan bi zanebûn bi qasid re dikeve nîqaşan, şev ku ser wan da tê, lê dixin ji dorpêçê dertên.

**Dewlet bi hemû hêza xwe êrîş dike**

Gundên wan vala kirine û wêran in. Ji ber ku Serhildana Agiriyê jî şikestiye, dewlet bi hemû hêza xwe ve tê ser wan, çiya û deşt tijî leşker û mîlîs in. Pir tengav dibin, êdî sitara wan di heremê de namîne. Seyîdxan bi komê re dişêwire, dixwazin derkevin dervayî sînoran, lê aliyê rojhilat girtiye, nikarin Tendûrekê derbas bibin. Yên dîsa binxetê biceribînin.

**Li gundê Zonê dispêrin axê**

Di ser Sason, Farqîn, Bismil, Amedê re xwe diavêjin Mêrdînê; lê mala îxanetê bişewite, dorj li wan tê pêçandin. Teyyare tim ser wan e, leşker û mîlîs dû wan. Pevçûna di 20'ê tirmeha 1932'yan de li nêzî tirba Siltan Şêxmûs, Seyîdxan û Teyfîqê birayê wî birîndar dibin. Birîna Teyfîq sivik e, lê ya Seyîdxan giran e. Seyîdxan ji hevalên xwe rica dike dibêje "êdî xêra min ji we re tune, gidî bextê we da me, birîna Teyfîqê bira sivik e, hewl bidin wî xelas bikin, bila koka mala me neqele." Du hevalên wî ber serê wî dimînin, yên din Teyfîq hildidin û derbasî binxetê dikin. Bi çûyîna wan re bîstekî şûnde ruh bi axîneke kur ji Seyîdxan dikişe, wî li nêzî tirba Siltan Şêxmûs di aqara gundê Zonê de dispêrin axê.

